
helbest

PÎREMÊRD



# Dîwan

## -I-

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Dîwanî Pîremêrd

# Dîwan

**PÎREMÊRD**

**(1867–1950)**

NEFEL
Stockholm
2005

[www.nefel.com](http://www.nefel.com)
[info@nefel.com](mailto:info@nefel.com)

**Pîremêrd:** Dîwan

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Nefel

Çapa dîjîtal: 2005
ISBN: 91-89687-21-3

Edîtor: Arif Zêrevan
Serastkirina latîniya kitêbê: Newzad Hirorî

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan

Ev kitêb bi hevkariya Nefelê û Xakê
hatiye amade kirin û weşandin.

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

## Nêwerok

Dîwanî Pîremêrd . . . . . 1
Aşiqe rûte . . . . . 11
Awatexwazî . . . . . 12
Awazî sazînasazî zeman . . . . . 15
Ay bo sermestî . . . . . 17
Badarî . . . . . 18
Bahuraye û mîwegenan . . . . . 19
Bangî beyan . . . . . 20
Baranî nîsan . . . . . 21
Be boney kotayî duwemîn cengî cîhanîyewe . . . . . 22
Be gorrînewe . . . . . 23
Be ziman nîye, îxlas hîsab e . . . . . 24
Be zubanî xoman eparrêmewe . . . . . 26
Befrî behar . . . . . 28
Befrî spî . . . . . 29
Beharî rûzerd . . . . . 30
Beharman bo hat . . . . . 31
Bendî xawker . . . . . 33
Bestey mektebî kiçan . . . . . 34
Beytî berx . . . . . 35
Bîrî diwaroj . . . . . 37
Bo ew zanayey wa le Çemçemall . . . . . 38
Her ew tê ega le qall û le hall . . . . . 38
Bo hefley Zehawî . . . . . 39
Bo kurd cejinî rast newroz e . . . . . 40
Bo Mehmûd Axa . . . . . 42
Bo Mistefa Paşa . . . . . 43
Bo Mistefa Paşay Yamullkî . . . . . 44
Bo Perwîn Qezaz . . . . . 46
Bo rojnamey Jiyan . . . . . 47
Bo Sanîhey Emîn Zekî Beg . . . . . 48
Bo yadgarî gewreyekî kurdewarî . . . . . 49

Bo xizmetî yar . . . 50
Bulbul behar e . . . 52
Carê le kiwêstan . . . 53
Cejin û behar . . . 54
Cînasî kurdî . . . 55
Çawerrwanî . . . 56
Çete ger kiz bê . . . 57
Dastanêkî jiyanî pêşûman . . . 60
Diwênê û emrro . . . 62
Ellêm derçim . . . 64
Em asmane şîne . . . 65
Em xake pake . . . 66
Emrro... . . . 68
Epirsî çon in? . . . 70
Estêrey bextim . . . 71
Ew cejney . . . 73
Ew ’eşqe . . . 74
Ew xuwapêdaw e . . . 76
Ey kiçîne . . . 77
Ey mangî taze . . . 78
Ême ke kurd în . . . 79
Êsta xew.. . . . 81
Felsefe . . . 82
Felsefey şî’rî kurdi . . . 83
Feryadî Pîremêrd . . . 84
Gallte û gep (1) . . . 85
Gallte û gep (2) . . . 86
Gallte û gep (3) . . . 89
Galltey berrast . . . 92
Gelawêj edirewşêtewe . . . 94
Girrûgallî pîrî çawgel . . . 95
Gîpe . . . 97
Goranîy mektebî kiçan . . . 98
Gulleweçinî . . . 99
Hecî Pîremêrd! . . . 100
Hecûy espêk . . . 102
Hefse behare . . . 103

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hejar û stemkar ........ 105
Hunerî polî poyledaran ........ 108
Îdman ........ 109
Kay kon be ba ........ 110
Kiwêxa Remezanî Wirmziyari ........ 111
Kizey derûnî gişt kurdewarî ........ 112
Konepoşî ........ 113
Kurdîy rewan (1) ........ 115
Kurdîy rewan (2) ........ 116
Lafawekey Silêmanî ........ 117
Laney dillan (1) ........ 118
Laney dillan (2) ........ 119
Lasay tuhfey tufahî şa'îrêkman ........ 120
Le debaşanîyewe bo Mela Necmedîn ........ 122
Le mewlûy pêxembera ........ 123
Le trenî rêy Estemûll da ........ 124
Matem ........ 125
Mewlûdî pêxember ........ 126
Mizgewtî Xurmall ........ 128
Modey kon ........ 130
Munacatêk ........ 131
Nalley pîrî pîran (1a) ........ 132
Nalley pîrî pîran (1b) ........ 134
Nalley pîrî pîran (2) ........ 135
Nalley pîrî pîran (3a) ........ 137
Nalley pîrî pîran (3b) ........ 139
Nalley pîrî pîran (4a) ........ 140
Nalley pîrî pîran (4b) ........ 141
Nalley pîrî pîran (5a) ........ 143
Nalley pîrî pîran (5b) ........ 144
Nalley pîrî pîran (6a) ........ 146
Nalley pîrî pîran (6b) ........ 147
Nalley pîrî pîran (7) ........ 149
Nalley pîrî pîran (8) ........ 151
Nalley pîrî pîran (9) ........ 153
Nalley pîrî pîran (10) ........ 155
Nalley dilltengî ........ 157

Neşîdî matem (1). . . . . . . . . . 158
Neşîdî matem (2). . . . . . . . . . 160
Neşîdî zanistî bo newroz . . . . . . . . . . 161
Newrozaney Nesrîn û Perwîn . . . . . . . . . . 162
Newrozî martî 1948 . . . . . . . . . . 164
Nimûney kurdîy petî . . . . . . . . . . 165
Min û estêrekan. . . . . . . . . . 165
Pendî ballinde . . . . . . . . . . 166
Pendêkî baş. . . . . . . . . . 169
Peyrrewî şa'îrêkî betam . . . . . . . . . . 171
Peyrrewî şa'îrêkî bênaw . . . . . . . . . . 172
Pêhellixzan e. . . . . . . . . . 173
Pêşrrewî ziyaretî Mewlewî . . . . . . . . . . 174
Pîrozaney zanistî. . . . . . . . . . 175
Poker û coker . . . . . . . . . . 177
Rastî . . . . . . . . . . 178
Razî dill . . . . . . . . . . 180
Rû le xoşî . . . . . . . . . . 182
Serguzeştey pêrêjinan bo mindallî giwê agirdan . . . . . . . . . . 183
Sermestî rojû . . . . . . . . . . 187
Serserî . . . . . . . . . . 189
Seyran û şayî. . . . . . . . . . 190
Seyrî jiyanî kurd . . . . . . . . . . 191
Sirûd bo newciwanan. . . . . . . . . . 193
Stayşêkî pêxemer . . . . . . . . . . 194
Şeşî eylûl. . . . . . . . . . 196
Şêx Ewilqadirî Goptepeyiş royî . . . . . . . . . . 198
Şînîy Ebdulqadir . . . . . . . . . . 199
Şînîy Ebdulwahîd Nûrî . . . . . . . . . . 200
Şînîy matemî Emîn Zekî Beg. . . . . . . . . . 201
Şînîy Mistefa Efendî . . . . . . . . . . 202
Şînîy muherrem. . . . . . . . . . 203
Şî'rî serbest . . . . . . . . . . 205
Şîwenî şehîdanî kurd . . . . . . . . . . 207
Şorre bî . . . . . . . . . . 210
Tafî ciwanî . . . . . . . . . . 211
Taqtaqkere . . . . . . . . . . 213

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Tavgey Zellim (1) ..... 215
Tavgekey zellim (2) ..... 217
Tazegullî çîmen în ..... 219
Tefre û çaw û rawî pif helldiraw ..... 220
Temaşay cîhan ..... 221
Tesewîf ..... 223
Te'zêdar ..... 224
Tiwancî mîlliyet ..... 227
Tozê le tozî bay Silêmanî ..... 229
Watey bêsûd ..... 230
Watey kon ..... 232
Wîrrewîrr, bo ziwîr..! ..... 234
Xakekeman ..... 236
Xalle ..... 237
Xellkî hawarî ..... 239
Xeyallatî dewrî kon ..... 240
Xeyallî xallî ..... 241
Xizmîne çi şitêkî....... ..... 242
Xozge ..... 243
Ya pêxemer ..... 244
Yadêkî hezîn ..... 245
Yadî nazdaranî caf ..... 246
Zehabî Zehawî ..... 249
Zerdeştî ..... 250

## Aşiqe rûte

Ay giyane cergim, ay giyane cergim
Tiwêtiwê ye, bê to, tiwêy perrey cergim
Le dewrit dûr im, nizîk e mergim
Be xwênî dîdem, gullgûn e bergim

Xuwa bew cemalley ke be toy dawe
Şorî cinûnî xiste dinyawe
Eqll û hoş û fam lay kes nemawe
Qiyamet be qed qamet hellsawe

Giyane to ciwan î, aramî can î
Xot meşarewe heta etwanî
Bo ême seyrî sun'î Yezdanî
Bo toş serfitre û zekatî ciwanî

Metirse, ewey ke to ebînê
Nayewê deqî ciwanît bişkênê
'Eşqî saf aşiq be roh ejênê
Arezûy wesllî le la namênê

Hana hey serxêll, nazdaranî Caf
To awêne be bo eşqêkî saf
Alûde mebe be laf û gezaf
Bo rohî eşqim bibe be metaf

## Awatexwazî

Emsallîş dîsan wa geyime behar
Sewzey mêrxuzar, sozey murxzar

Dugmey ser sîney beyan tiraza
Beyan be gullî spî û sûr raza

Hewrî beharî kirdî be hellda
Gulalle xeymey allî xoy hellda

Berx û karjoley behar be qetar
Hellperrkêyane, be beste û qetar

Ke bay dar awis eşnêtewe
Piyaw xoy tê dega, ebûjêtewe

Ew bayey xakî zîndû kirdewe
Pîrî le bîrî pîran birdewe

Be demax xoy da le demaxî min
Ax bêdemax e gullebaxî min

Be dest pîrîyewe kokekokim e
Xwazbênî befr û hellekokim e

Tuxwa, sa kurrgel, êwe û xuway xotan
Seyr ken le batîm ta deliwê botan

Ke jîn û behar herdû bayek bê
Cewanî û ciwanî herdû ba yek bê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Jîn ew jîne ye beyanî behar
Le goşey awê û yarêkî dilldar

Dû dill, yek bo yek awatexwaz bê
Nek be nengewîst niyaz û naz bê

Dillyan wek awî beyaniyan rûn bê
Be neş'ey sewda, rûy yar gullgûn bê

Tîşkî roj bida lew awe ciwane
Şewq bidate ser kullm û birrwane

Be zerdexene sergonay çall bê
Be boy henase hellgirrê û all bê

Dill serasîmey şêwey nazî bê
Giwêy hellqe le giwêy şîrînrazî bê

Giyan badey xemzey çawî binoşê
Dest bêpirs sêwî sîney biposê

Ew sîne safe şewq bidate aw
Aw bête lerze, şerim hellsê le naw

Sermestî sewda û ser le ser ran bê
Egirîce le ser rûy perîşan bê

Ew şilkey rane û zullfe sed terze
Dill wek bîy naw aw bênête lerze

Demdem bestey tam dû lêwî all bê
Zubanî beste, zubanit lall bê

Înca betkay nîga û be niyaz
Razî dill bête ser gurîşme û naz

Bellam eşqî pak neden be awa
Dillêkî pakî mindallî sawa

Çunku eşqî pak ta ser emênê
Wicûdîş nebê, rohit ejênê

Ewî natwanê ke xoy ragirê
Xollemêş eba le şiwênî girrê

Yaxu etwanê ke yekê berê
Sewday xoy bika û le sewda gerrê

Wesllî çiray 'eşq ekujênêtewe
Giyan le tarîkî emênêtewe

Le wê da roh û nefs dekewne şerr
Zînhar meyêlle nefs bikewête ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Awazî sazînasazî zeman

Ay çîm be ser hat, ay çîm be ser hat!
Xoşim nazanim boç wam be ser hat

Le dûriyanî rêy hat û nehat
Rêpîşanderim le tekma nehat!!

Kewtime ser rêgay telîsmî erjeng
Gîrodey sîhrim bêseda û bêdeng

Ebînim kemayan danawe bo şêr
Goştîş bo giwêdirêj, hîçyan nabin têr

Minîş le daxî nasazîy zeman
Le cê da kewtûm bê dest bê ziman

Rengzerd û lawaz, bê yar, bê xemxwar
Eyşim la tall e wêney jarî mar

Be cestey xestey pirr derd û keder
Koney çend sallem lê kirdote ber

Çawim nabînê û mat û xemgîn im
Ew çatir!! Çarey casûs nabînim

Kaşka giwêçkeyşim wa neybîstaye
Her dengê ebyem!! Her nalley tiya ye

Le layê şayî û le layê roro
Le layê qumar, layê tiyatro

Em qurre reşey wa têy çeqîwim
Hêzî tekan û cûlley birrîwim

Hanam be to ye Xuway perwerdgar
Ya taqet, ya merg, ya dîdarî yar


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Ay bo sermestî

Ay bo sermestî tafî ciwanî
Ciwanî şewq e bo zîndeganî

Çend xoş e neş’ey eşqî dêkanî
Ke kiçe kurdêk eçêt bo kanî

Gozey mêşero wa le ser şanî
Aw etkênê bo ser zullfanî

Mêxek bend exşê le naw memkanî
Hezar elmode bê be qurbanî

## Badarî

Ême mayey çiwar siruşt în: aw û agir û xak û ba
Em hewêne kamî ziyatir bê, be lay ewya eba

Xak û aw dayik in, leserxo n, hêminî û rûnî eden
Agir û ba zor xirap in, xullqetî piyaw têk eden

”ba” legell kewte çîkilldane û le berzî da firrî
Katêkit zanî ke ”f” û ”t” îtir hêlkî birrî

Fend û fêllit kewte rû, ey çerx! Le lam abrrût tika
Boye berzit kirdmewe bimxeyt û azarim biga

Êste zanîm boye hêlanem wêran bû, têk şika
Terze û hewretirîşqe û befir û ba sextim bika

Min ke wa berz bûmewe û kewtim, gunahî kes nîye
Boye nagirîm tê degem xokirdû we, tedbîr çî ye?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Bahuraye û mîwegenan

Emşew ke dey temmuz bû, le ser şaxî tarîder
Çend xoş bû şewqî agir û ’eksî ziyay qemer

Agir heraretêkî debexşî le ser zemîn
Mangîş birûdetêkî bilaw kirdewe le ser

Beh xaşexaşî gellay ser dirextekan
Hey hey le qaspeqaspî kewî şaxekan seher

Laye wîzey semawer û laye çizey kebab
Doy sard û mizrî bû be mezey keyfî bêxeter

Şaxanî Ewrupa be fîday em billindîye
Her menzerey tebî’ekey nayelê keder

## Bangî beyan

Pîr û uftade û rencûr û xembar
Bê hîway jîn û jiyan nalle kar

Le dest bêdadî şay teqyanûsî
Tarîxî mergî xomim enûsî

Wek derwêşekey golî zirêbar
Kewill û postî xom kêşabuwe kenar

Merzî Kurdistan tar û şewezeng
Şarî xamoşan bêdeng, bêaheng

Textî text bûbû Baba Erdellan
Kelawey kawil, peykull, berdellan

Înca le qapî şay perwerdgar
Ah û henasey pîran kewte kar

Naga asoy şerq be şebeqî nûr
Wek xwênî ciwanan bû be taray sûr

Min bo ye rengî sûrim xoş ewê
Mijdey şefeqî lê derdekewê

Seday sella û bang, awazey şadî
Ew şewey kirde rojî azadî

## Baranî nîsan

Baranî nîsan bû be mirwarî
Be rehmet be ser ême da barî

Zanistî beynê birewî kem bû
Wek gewher le naw sedef da win bû

Xewwasî 'îrfan le neslî xewwas
Zanistî le gêjgêjî kird xelas

Zanistî û zanist yaxwa bimênin
Bellku bêkesan be şew bixwênin

Xwêndinî şewe roj ekatewe
Perdey tarîkî la ebatewe

## Be boney kotayî duwemîn cengî cîhanîyewe

Hîcazî kurdî û neway êraqî
Herdû le kara n, samey, hey saqî

Emrro rojêk e şerr birrayewe
Dergay şadîman bo kirayewe

Le sayey Xuwawe, pêman kewt peyman
Ke hawpeymanan bûbûn be teyman

Êsta le şayîy siwêndxorekan da
Dengî deholl dê le Kurdistan da

Wa be hellperrkêyiş berz ebînewe
Be pîrî eçîn, be pîr jînewe

Ho ho jîn! Hey jîn le Kurdistan da
Xawen mujde bî le say Yezdan da

Lawkî kurdî bo lawanit e
Cennet el-me'wa nîştimanit e

Nawêrim le me ziyatirî billêm
Qetar û Zebûr wek yek dête giwêm

## Be gorrînewe

To wam tê mege her çiyagerdim
Min xawen supay endêşe û derd im

Herçî le deşt û çiya û ser awe
Le batî şêtî Xuwa be minî dawe

Sifîdey beyan, zerdey xoretaw
Tirîfey mang û lence û larî aw

Sill û awrru, gerdinberzîy ask
Qaspeqaspî kew le ser aso û ask

Gull û gulalle û nêrgisî behar
Şoxî perreza û çinûr le nzar

Emane yek yek be to ebexşim
Toş le şêwey xot bimderê beşim

Bo sifîdey subh, say berokeket
Bo zerdey xorîş, zerdexeneket

Mang bo ruxsarit, aw bo cebînit
Remî ahûyiş bo şêwey şîrînit

Qaspeqaspî kew bo qaqay ciwanit
Nexmey bulbul bo wirde razanit

Gull bo nazikît, gullaleyiş lêwit
Çinûr bo lûlîy zullfî peşêwit

Emanem le gell bigorrerewe
Berawirdiyanke û gire û berewe

## Be ziman nîye, îxlas hîsab e

Berdtaşê 'eşqî Xuday kewte ser
Xuway xoş ewîst, le ra bê xeber

Bo xwaperistî çûwe kêwî Tor
Şaxekey taşî bo xoy kird be jûr

Way dezanî Xuwa wek ême wa ye
Derbestî nan û niwên û kewa ye

Deygut: Xuday xom, bînayî çawan
Rojê were lam bibe be mîwan!

Dest û pêt eşom be sabûn û aw
Nallçey pêllawit egirme ser çaw

Eçim le lay şiwan şîrit bo dênim
'Ûd û bixûrit bo desûtênim

Mandûy? Serxewê bişkêne le lam
Êşkit egirim. Metirse, aza m!

Eparrayewe herwa eynalland
Be soz û giryan cergî esûtand

Ta rojê Mûsa çûbuwe kêwî Tor
Giwêy le dengê bû, eynalland le dûr

Çû pêy wit: Kabra, boç to nazanî
Xuwa beşer nîye bêt be mîwanî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Carê min gutim: Xotim nîşan de!
Fermûy: Nambînî. Xot ezyet mede

Sengteraş girya be dillşikawî
Xuwa fermûy: Mûsa to natewawî

Xoşewîstî min boç errencênî?
Ew dilley minî tiya m eyşkênî?

Ewî be ziban zîkrî min deka
Hîç e. Em bo min wa kêw kun deka

## Be zubanî xoman eparrêmewe

Xuway gewre û buzurg, padişay rebbî niyaz
Bêhawbeş, bêkes, bêşiwên, bêhawrraz

Têgeyiştinit damê têt bigem
Pêm lê na, her to yî bê ziyad û kem

Çawim hellbirrî, asmanim dî
Witim: Bê westa nehatote dî

Eger kirdewey bêgane biwaye
Eşiya bê stûn ranewestaye

Diyar e her çerxê piyaw dirustî ka
Katêkit zanî siwa û têk şka

Çerxî makîney em roj û şewe
Bê hellm û benzîn exulêtewe

Çewrî pê nawê, hîç jeng nagirê
Lêk hellnaweşê, destî tê nabirê

Her lew rojewe ke têk xirawe
Hêşta cerrêkî lê negorrawe

Her bew pê û dane ke bot danawe
Wa dêt û deçê hîç newestawe

Bêgurreûbirr e, bêçirpe û bêdeng
Têkrra le karan yekreng, yekaheng

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

To nebûytaye çon têk exra
Emane le kiwê pêkewe enra

Çon çerxî gerdûn bê destî westa
Le kara ebû hetaku êsta

Aş bê aşwesta nanirêtewe
Ga bê hoy cûtyar nagerrêtewe

Sed hezar hezar estêrenasan
Ewdîw xêwetyan nedî be asan

Minîş egerrêm ke to binasim
Natdozimewe kiwêr û kesas im

Çawêkim berê toy pê bibînim
Erînî-bêj nîm, kirdewebîn im

Destim pê girtûy şermendem meke
Bo bexşîn gunay zor û kem yek e

Her kirdeweyek le min rûy dawe
Le pêş kirdina lay to nûsrawe

Ke lew texteyey lay to nûsra bê
Kê rêy dekewê billê wa nabê

## Befrî behar

Befrî rûspî be deme û behar
Serî dayewe, sermay pê bû har

Awedanî û çoll wek pemudan e
Lelokey befra têk ra penhan e

Dillsard û rûrreş bêbezeyî ye
Rûspêtîyekey nawê turkî ye

Wek genmeşamîy birêşkey ser sac
Spî hellgerra, hejar bê 'îlac

Kilke xakenaz le serma sûta
Giwêswanekanman be zuqim rûxa

Gopkey dirextî nazdarî tirsan
Pelkî wenewşey sîs kird, çirûsan

Ew çawe ciwaney nêrgisî kiwêr kird
Bestellek destî xanimellêy bird

Pîrêjin ellê: Befir ard buwe
Qediryan negirtuwe û le kîsyan çuwe

Çî debû, befir şekir buwaye?
Sermaye ebû bo em sermaye

Hatuwe xoy pîşan hellekok eda
Carrî rîswayî kokekok eda


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Befrî spî

Befrî spî ke rojî reşî bêtifaqî ye
Hênd xwênî sard e, rospîyekî suqaqî ye

Rûy wek xellûz bêdar û xellûzman giran eka
’Alem weku hetîw le destî zaqezaqî ye

Wa rêwî pêste tûknekey hellgêrrayewe
Kirdî be kewll û kellkî nebû, waqewaqî ye

Giwarey çiley çilûle ye bo xatû zemherîr
Giwêswane bestî, besyetî nore telaqî ye

Lew lawe, paredar şewî pê roj ekatewe
Mêzî qumar û dengî qetar, dewrî saqî ye

Rojêk ebê emane ke teyyî ssicilî hemûy
Hellpêçrê û billên: Eme yewmu ttelaqî ye

Ay bo ewey ke emrro beşî xoy le pêşewe
Nard û îtir emîn e ke gencêkî baqî ye

## Beharî rûzerd

Beharî rûzerd, beharî rûzerd
Minîşî xiste kej û kêw û herd

Rengzerd û serşîn derûn pirr le derd
Bo ’alem şadî û bo min ahî serd

Cergim letlet e wek hêllî naw werd
Ax bo dillsozêk bom bê be hawderd

Reng hellbirrêjê le şêwey behar
Lew rengey xoş bê lay dilley xembar

Le gullezerd reng, le gullnewroz dax
Le şewnim firmêsk, le temî çem ax

Le wenewşe şîn, le nêrgiz xumar
Le gulalle xwên, dîdey şewbêdar

Le xunçey peykan, le sewisen xarê
Dill birîndar ka le dûrî yarê

Min le dûrî êll cergim xwênîn bê
Çend xoş e birîn le ser birîn bê

Egerrêm be şiwên derdedarêka
Kesûkar kujraw dillzamarêka

Wek taqtaqker e ta demî beyan
Nallenallim e le ser kelîxan

Lafawî firmêsk le dûrî yaran
Serewxwar errwa wek lêzmey baran


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Beharman bo hat

Beharman bo hat, bellam be birsî
Kes le seyran û şayî nepirsî

Sallan her basî gull û gullzar bû
Neş'ey nêrgisî dû dîdey yar bû

Bangî bulbul bû le ser çillî gull
Temî zistanî errewand le dill

Emsall kingir û gêlaxe baw e
Çunku giranî û mirdin le naw e

Hêşta zistan e û tazebirîn în
Xaw nebûynewe, xoman bibînîn

Hetawî behar berdî gerim kird
Katêkit zanî wityan: Fillan mird

Le ber ewe ye, wek bêsaranî
Lem behare da bûme zîndanî

Ew fermûyetî: Newbehar siyan
Emsall we dîdem newbehar siyan

Nûrî bînayîm ce dîdem ciyan
Be hîç rengê da meta û diyan

Min heryend megnum çem we dînî gull
Çun xunçey newxêz letlet mebû dill

Her gull neşterê, her sewsen xarê
Her çemen zîndan, her şetaw marê

We bextim bidiye çe tewrê şêwyan
Supay meynetan wenem dîwiyan

Wa bulbul be ser gull da exwênê
Nexmey zebûrî Dawid enwênê

Ew be neş'ey keyf, min be daxewe
Nallenallman bê le toy baxewe

Çunku mehrûm im le behar carê
Ser denêmewe le pay muxarê

Bem hemû derde û be dîdey nimnak
Haka xelltan bûm rojê le rûy xak

Ax bo hemderdê hawdem û yar bê
Wek min xefetbar dill birîndar bê

Destî yek bigrîn, rû bikeyne şaxan
Pêkewe bigrîn her dû le daxan

Em xakey kewa le rûy zemîn da
Silêmanî ye le rûy nigîn da

Têk hellşêwawe be bay ballî dêw
Hemû le birsa rû dekene kêw

Destî dillsozê dewayan naka
Wa detillênewe le perdey xaka


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Bendî xawker

Witim: Oxey em areqî dill e
Xwênawî tîrî mujganî gull e

Wa dillim tamî zamî birdewe
Ax bay baweşên sardî kirdewe

## Bestey mektebî kiçan

Çend xoş e hestanî demî beyanyan
Bo giyanî rûn nûr debarê le asman

Le cê hestam cirîwey çoleke hat
Çawim şûşt û cilim gorrî, roj hellat

Çam xwardewe û cantam girt be destewe
Hatime mekteb çûme sinfî dersewe

Ça, bû şukir be dersim da geyiştim
Dîte? Zû hestabûm, çak tê geyiştim

Rûm kirde Xuwa be dill lêy parramewe
Înca lêy danîştim be aramewe

Bîrî emem dekirdewe, axo dejîn
Bem xwêndine kellkî nîştiman bigrîn?

Bellê boye arezûy xwêndin ekem
Her xwêndin e awa ka willatekem

Roj le rojhellat hellat bem xwêndine
Xwêndin bo diwarroj wek towçendin e

Tow deçênim mîllet pêy derrwêtewe
Bem koşişe pere egirê netewe

Wilatim awa bê, minîş ke mirdim
Rohim nîgehbanî ye, kiçe kurd im


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Beytî berx

Babe! Seyrî em berxe ke çend ciwan e!
Rolle ewe berxî merrî xoman e

Babe tuxwa ba em berxe hî min bê
Way lê ekem qoç lê neda, hêmin bê

Rolle to em berxet boçî xoş ewê?
Barrey xoş e û hogirim e, dûm ekewê

Wa dam be to, çonî be xêw ekey? Eyzanî?
Bîşo, çakî ragire heta etwanî

Em berxe ke be xêw bikirê û bê be merr
Le mêw û sêw çaktir boman dête ber

Şîrî ebê eyxoynewe sibeynan
Sertiwêjî mastekey exoyn legell nan

Keşk û şîrêj û siwîreke û penîrî
Eyxoyt, bo kesûkartî enêrî

Xurîy ekey be cacim û popeşmîn
Be bermall û cewall, şall û serzîn

Be zawûzê pere egirin, zor ebin
Ranêkî lê dête ber nayên le bin

Ke mîwan hat serî ebirrîn, goştekey
Ne' û new, babe! Tuxwa qet ewe nekey

Bestezman e, xaneza ye, şîrmij e
Wek ême jînî xoş ewê, meykuje

Berxêk ke ewende çakey bê boman
Serî mebirre! Nebête gunah boman

## Bîrî diwaroj

Ballûll çuwe lay Harrûne Reşîd
Witî: Şêtêkim 'eqill napedîd

Bellam pirsêkim heye lêt dekem
Têm bigeyêne bê ziyad û kem

Alltûn û gunah, kamit xoş ewê?
Witî: Wa dellêy şêt ît derkewê

Kêt dîwe pare bida be gunah?
Ballûll witî: Min şêt im bellam ah

To ke emende le şiwên mall wêll î
Gunah ebeyt û mall be cê dêllî

Tenha gunah e wefa deniwênê
Le gorr da ewit, le la emênê

Ême bêwefayn ke le xak derdêyin
Be fîzêkewe pêy pê da enêyin

Bang eka hêwaş, pêt na be dillma
Nallit çeqîye kullmî wek gullma

## Bo ew zanayey wa le Çemçemall
## Her ew tê ega le qall û le hall

Le lam textî Suleyman bo ye ba eybird be asmana
Bizanin selltenet ba ye, beqa nabê le însana

Ke wa bê, ke wayiş bim, textî babirdûm le la ba ye
Ke ba bê, ba kebabê bê, ke babîşim be xorra ye

Mellên to newsinî! Bawkim be nanê cennetî dorrand
Min ew nane kebabîşî le gell bû dillmî hellsûrrand

Le kurdî da kebab babolle ye, bawkêk e wek bab e
Le firzend bim îtir bo? Qedrî babe negirim? Erê babe!

Ellên alltûn be hellkendin be dest dênin le naw berda
Be rohkendin meger pareperistê destî lê berda

Be sed dane dellek zatê le ser kursî newab danra
Dellek nebiwaye çon wa zûbezû ew cêye bew edira

Be birjang dewrî çawî xom tenî, telbendî pasar e
Ne wek xew bêt û ew derçê, ke xew zordar û lasar e
Hemûy Hîtler bû qewmandî, ecel lem nawe bednaw e!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Bo hefley Zehawî

Bawerr dekem ke rohî billind namirê her dejî
Caran be xew bû, êste be dîmane hate dî

Çend giyanî mirdû bang ekirê, giftûgo eka
Fen bo jiyan, ta serî giyan cistûco eka

Birrwane asman bote cîlwegahî nûr
Giyanî Zehawî ye ke edirewşêtewe le dûr

Giwêm lê ye bang eka ke be xêr bên be komellî
Em hatinetan nîşane ye bo rengî yekdillî

Şad im be mey be meyle we yadawerîm eken
Diyar e be qedrî xwêndine we berz ebêt weten

Ta hurmetî guzeşte bê, taze pê ega
Xwênî hemaset helldequllênê le naw rega

Derkewt Zehawî wa le dillî ême da ejî
Çend bextiyar e, diyar e ke awatî hate dî

Sed sallî tir bipirsî: Cemîl Sidqî wa le kiwê?
Dengî billindî xoy le hemû şi'rê dête giwê

Nallêm ke heykelêkî bibê, wêne, mirduwe
Dîwanî şi'rî çaktir e, nawdar e, zîndû we

Pêrar be şi'rî ew bû ke Fîrdewsî Nasira
Fîrdews buwe hewarî dû Fîrdewsîy wek bira

Kake Cemîl! Be yadî cemîlit bû şi'rim hat
Raweste! Zorî nawê, wext e miniş bême lat

## Bo kurd cejinî rast newroz e

Par dête bîrim wek xewê
Ke dîbêtim pêrê şewê
Min sallêkî tazem dewê
Ke kurd beharî ber kewê
Wetenman pêy bê be gullzar

Mijde bê sall gerrayewe
Agirî newroz kirayewe
Befrî zistan tiwayewe
Giya û gull û dill jiyayewe
Nuxşeyiş bê le kurdî hejar

Gull le baxa xoy deniwênê
Bulbul be rûya dexwênê
Hewir mirwarî depirjênê
Şemall zîndeganî dênê
Nêrgis mest e û çaw be xumar

Wa ferşî çîmen raxira
Gullalle bû be şewçira
Gull desteyan best wek bira
Nesrîn û lawlaw têk xira
Hatine lence seru û çinar

Bulbul şew be awatewe
Badey şewnim dexwatewe
Degirî be munacatewe
Bellku gull dem bikatewe
Em pê bikenê ew bigrî be zar


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Wenewşe wek min şînpoş e
Gerdinî keç kirduwe, xamoş e
Beharî lela naxoşe (11)
Matem degirê û be peroş e
Bo kurdî bêkesî hejar

Xuwa zewî zîndû kirdewe
Temî le ser la birdewe
Kurd be dirişt û wirdewe
Destî du'ay berz kirdewe
Xuwa ewanîş bika rizgar

Agirê le ser girdî yar e
Le textgay Xuwawe diyar e
Agirî newroz û behar e
Çiray rêy perwerdgar e
Le gell nûrî Tûr bû be yar

Awî ew karêze ciwane
Bêqewze û rûn û rewane
Awêney dillî kurdan e
Derman eka le tengane
Kewte kar nalley îxtiyar

## Bo Mehmûd Axa

Ax ax û dax dax, wey wey û ro ro
Her heşt be carêk lêm hatûne so

Ay Mehmûd … axay! Siwarey me'îyet
Simêllbabirrî besam û heybet

Be wefa û namûs piyawî qedîm bû
Bo wezîranî pêşû nedîm bû

Daxekem ême qedirman nezanî
Hetaku ecel firsetî hanî

Bawerrim nîye piyawêkî weha
Lem zemane da bêtewe dinya

Bo tarîx ewey ke cergî dax e
Ellê: Ah sed heyf bo Mehmûd Axe

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Bo Mistefa Paşa

Ême ke emrro dillman xemgîn e
Cejnî azadman le la wek şîn e

Mistefa Paşa dênînewe yad
Mîlletperwer bû kurd û serazad

Bûk û kiçîşî bûn be raberman
Be wan hatine naw mektebî kiçan

Min ke nimûney ew hîmetane m
Bo pêşkewtinî qewmêk nîşane m

## Bo Mistefa Paşay Yamullkî

Em qewmî kurde zor gewrey buwe
Bellam her yekey bo layek çuwe

Nadir û Kerîmxan kewtûne Êran
Ezîzî Mîsr e Selaheddîn man

Emane beşî îdarîman bû
Le asoy ’îlma billindtirman bû

Çunke Kurdistan xoy bênesî be
Edîbekanî tiya da xerî be

Xo Ehmed Şewqî û Mihemmed ’Ebde
Şu’eray ereb le layan ’ebd e

Daxî ser daxan Cemîl Zehawî
Le naw kurdan da win bûbû nawî

Belê mumkîn e Cemîl edizrê
Bellam Zehawî le kurd naxwazrê

Ba eybîş bûbê kafî Zehaw e
Herçî xoy gorrî diyar e bednawe!

Mistefa Paşa bûye pesende
Fexrî be kurd bû lay Xuwa û bende

Le wesiyetîş da xoy lê negorra
Be wesiyetî xoy le Seywan nêjra

Le ser kurdêkman xîretî wa bû
Be gij şahekey Êran da eçû

Bîgre baweşit ey girdî Seywan
Paşay Kurdistan hatuwe be mîwan

Kurr gel gewretan eger xoş biwê
Zor gewrey tirtan tiya helldekewê

Emrro em yad e bû be yadgar
Zor kes hewill eda bo man bête kar

## Bo Perwîn Qezaz

Xuşke giyan Perwîn, estêrey asman î
Ke çaw helldênî û helldêy hêndey Wînos ciwan î

Le pelkey Ayşe û Fatme colanet bo hellxem
Be peyjey ‘Îsa da le asmanit ser xem

Firîştekan dêne lat ke xotit nîşan da
Rayankêşe xwarê be rêy kakêşan da

Ba le naw kurdan da Bellkîsê peyda bê
Mullkî Silêmanî ser le niwê awa bê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Bo rojnamey Jiyan

Oxey sed şukur derçuwewe Jiyan
La çû tarîkî pêş çawî kurdan

Eme nîşaney bextiyarî ye
Ke Jiyan şewqî lêman diyarî ye

Wextê Jiyanman lê nadiyar bû
Gişt ehlî kurdan wek matemdar bû

Îsta be Jiyan wa dillman rûn e
Yaxwa ta ser bê em çendûçûne

## Bo Sanîhey Emîn Zekî Beg

Estêreyekî geş be ziyay mangî bedirewe
Ser goyje kewt û bo wetenî xoy çiray şew e

Esllî le neslî qutbî şîmal e be rewşenî
Wek bêçuwe qutb e merkezî Zewra, nişîmenî

Çend sall le Xuwam ewîst le kiçan da yekêkî wa
Lem xake hellkewê û be zeka bê, be cêy hîwa

Wa em hîwaye hatote dî zor be dillxoşî
Cînsî letîf û şî'rî sinûhatî dillkeşî

Ey Sanîhatî zadey teb'î willatekem
Nûsînî rutî to ye xellat û beratekem

Gullxenderanî bawkit û min ciwan ekeytewe
Em husn û hîsseye girewî pê debeytewe

Bawkit ke wêneyekî tirî nayete cîhan
Pêy xoş e to ke têperrî lew nûrî nîştiman


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Bo yadgarî gewreyekî kurdewarî

Ayînî îslam derîxistûwe
Diway mirdin giyanî welî zîndû we

Welî sîfatî Xuday tê da ye
Na'îbî nebî û le bend reha ye

Be hîdayetî Xuda mehzûz e
Nebî me'sûm e, welî mehfûz e

Sîfetî payey wilayet siyan e:
Îlm û edeb û zîkrî subhan e

Cige lewe ew babî hejar bû
Çake û keremî hezar hezar bû

## Bo xizmetî yar

Em şew bom rêkewt, çûme xizmet yar
Ne rêy pasewan, ne bed, ne exyar
Tenha se'atê, tenha min û yar

Şew xerqey nîlîy qetranî poşa
Kelleşêr bêdeng, bangî nexiroşa

Murxî 'erş le cêy xoy hellnîştibû
Diyar bû mandûyetî rojî çêşt bû

Kakêşan barî kerî kewtibû
Reşkekayî le ser rê hellriştibû

Gay hewtewane kay zor xwardibû
Hewsarî bedest qutib spardbû

Ew şewe Leyla û Mecnûn lêk kewtin
Hêcgar le 'eşqa nedesirewtin

Awatexwazî xellik hatibuwe dî
Le rûy eflaka cûllet needî

Hellsam xom gurc kird, aza, şêrane
Nemdegut hîç kes le lam însan e!

Xerqey şewgerdîm kêşa be ser da
Çakî dawênim kird be kemer da

Royîm ta geyime astaney leyl
Şêtane wêney qeysekey Duceyl


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Geyime jûr serî le nîweşew da
Êşikçî kenîz hemû le xew da

Be edeb pêm na çûme serînî
Maçim kird xallî lêwî şîrînî

Çawî hellbirrî sewllî xeraman
Yexey dadirrî ser ta be daman

Witî: Kam bêşerim le nîweşew da
Wa hellîsandim le şîrînxew da?

Berqî ruxsarim bida le cesteyî
Hellîqirçênê endamî xesteyî

Witim: Ey şem'î rûy nazenînî
Perwaneket hat ta bîsûtênî

Min be hîway ser nehatme êre
Qurbanîyekey tom bimikuje, xêr e

Şorî 'eşqî to bê tirsî kirdûm
Herçend e zîndû m, le rîzey mirdû m

Çawit bîmarî be naw le ser e
Piyawkuştin le lay bîmar xeter e

## Bulbul behar e

Bulbul behare, şetaw behar e
Bang eken ellên: behrey behar e

Arayişî da be herde û kosar
Xemllî le gull da deşt û ber binar

Newroz rojî niwê le nêw cîhan da
Jînî dabeş kird be Kurdistan da

Dirêx! Beharî min eme nîye
Ke zû be ser çû gull kellkî çî ye?

Emewê xakî Kurdistan yekser
Gullî giyandarman bo bênête ber

Lawan wek lawlaw deallêne dar
Bo xakyan bibine perjînî giyandar

Ewsa Kurdistan ebê be baxê
Xwêndin tiya ebê be şewçiraxê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Carê le kiwêstan

Carê le kiwêstan le dem Kelîxan
Serxewim şkand hendê le paş nan

Jêrraxer nebû biniwim le serî
Yek dû kelermim le binda birrî

Ramxist be yadî leş û larî yar
Wek kilûy spî nazik û nazdar

Ebzutmewe ew cîrreyî ehat
Bew cîrrecîrre kewtibûme awat

Xozge leşêkî nazikî wam edî
Bellam xewê bû bom nehate dî

Emrro yekêkî leşsipî û nasik
Gummeteyî ebest wêney karasik

Be dewrima ehat, ha bigire û bêne
Weku çolekey şiwan xelletêne

Eçûm be şiwênya ew quney ekird
Ha lêre û lewê destim bo ebird

Cirrtêkî kêşa û witî: Min dinya m
Katêkim zanî her xom be tenya m

Dinyadestkewtin xeyallî xam e
Jinêk e wesllî her îhtîlam e

## Cejin û behar

*Goranîyeke le ser awazî 'îd el-fereh degutrê*

Cejin û behar, gull û gullzar
Zor be neş'edar

Bulbul le ser gull exwênê
Dinya zîndegî enwênê
Cejinman her bimênê

Be hîway cejnewe dill kirayewe
Beden û giyan le niwê aw dirayewe

Diyar e xoşî cejinman zortir bê
Çaktir e, dill deyewê xoştir bê

Cejin ekeyn, cejin ekeyn
Cejin ekeyn cejnî weten

Cejin û behar, gull û gullzar
Zor be neş'edar

Ême hewllî eweman e be hemû
Yek kewîn, ser kewîn, şad bîn zû be zû

Cejnî rastî ewe ye pêkewe bîn
Le willata be serazadî bijîn

Cejin ekeyn cejin ekeyn
Cejin ekeyn, cejnî weten

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Cînasî kurdî

Bay xezan xunçey xizand û dirrkî pîr her mayewe
Gêj e herçî xoy exate gêjî em dinyayewe

Dadî ayînman le dest meynoşî û reşpoşî ye
Heş be ser ew cejne, wa serxoşî ya serxoşî ye

Qijrinîn û pirçbirrîn bû, matemî caran, ke êsta qij nema
Pîrêjin ma, mûy birrûtênêtewe û bîda be ba

Zullf ke rûy dapoşiyaye, bang û hawaryan ekird
Xellke mang gîra le tepll û dumellek den, destûbird

Êste zullf birra, sifûrî mange, rûpoşî nema
Daxe hêllaney dillan şêwa we, bêbên e bonî seba

Bêt û şew to bêyte lam rojî! Çiram pêwîst nîye
To were û bimnase, pêşey min çira weku jênî ye!

Herkese hawarî çawî pîs eka û min çawî ciwan
Bendî cergî wa birrîwim, nîme yadî nîştiman

Em girr û gallane şêwey şî'rî kon e êsteke
Hewllî serberzîy gelit bê, zullf û rû giwêy lê meke

## Çawerrwanî

Oxey be ser çû zistanî bêjîn
Emrro behar e xunçey baxî jîn

Nizîke derçê be diyarî û xellat
Boman hellbidirê le dîwî perjîn

Ba perjîn bişkê xoman derkewîn
Le reşî derçûyn êstêke kejîn

Yaxwa baxewan baxit be ber bê
Le sayey to we êmeyiş çingqij în

Awman rûnak bû aw be çaw da keyn
Bo gêjney newroz yekcar dilltej în


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Çete ger kiz bê

Çete ger kiz bê, niwêjkere û çak e
Gurg kellbeyî neşkê, çawerrêy lak e

Pişîle ke le şiwên ciger ewdall e
Neyegeyiştê, pêy egut tall e

Siplle birsî bê, çaw berew jêr e
Ke têrîşî xward pêt ellê: Siwêr e

Çaw mebirrere dest newsin, fêr ebî!
Be parûy xellkî direng têr ebî

Ebê bo dinya dest bideyte dest
Hîç kesê hîç kes nabate beheşt

Felek dewlletit le dest esênê
Her nawî çak e bo to bimênê

Eger padşay rûy serzemîn î
Rojê bo nanê doş dademênî

Le pirrê kurrê, piyaw sersam eka
Tecrebey dewran însan ram eka

Ellên dill weku awêney nûr e
Bellam ke şka, letî tendûr e

Kawlekey weten hênde şîrîn e
Jarî dûpişkî ‘erbet hengiwîn e

Dirext nanêjin le tirsî terze
Hîn e, metirse û hîn e, melerze

Toş nebî dîsan newroz dêtewe
Xirûsîş nebê, roj ebêtewe

Qena'etkar im bê tirs û bê wey
Sîrwan lêt nedem hêşta her dembey?

Qapreş û Hemey piyawman bûn be piyaw
Karman dirust e têr pirr e le caw

Bellê hîç şayê bê şalyar nabê
Hîç bêstanêkîş bê kalyar nabê

Piyaw be zor bîben bo mazûçinîn
Errwanête dar, naçê le ber qîn

Ezanîn xallî le Xorasan e
Nazanîn çî ye ew renge ciwan e

Da'îm le gell yek şerrmane û hera
Hello be tîrî perrî xoy kujra

Ewî ke dellên şêr be giwê degirê
Kewte deryawe, dest be mar egirê

Rêwî be tenya be kuna neçû
Keçî hatewe hejgêkî le dû

Eger hekîmî bizanyaye wird
Keçell dermanî serî xoyî dekird

Dewllemend pareyî be kes nedawe
Ke çî zor kesî errwa le diwawe

Ew serey ser bê, bê killaw nabê
Derya be demî seg gillaw nabê

Piyaw ke dana bê rê be ’îş eba
To ba danaş bî, baz hem pirs eba

Mellên şîlawg mayey penîr e
Fîtne hewênî no mencell şîr e

Be xizmayetî hemû her lek in
Ker û xollemêş amozay yek in

Bo mîwandarî bû be behane
Xizmî xezurî letkey şêxan e

Endazeêyk e bo çawlêtirsan
Tawê le pîran, şewê le zistan

## Dastanêkî jiyanî pêşûman

Caran de roj be heçeheçe û bareberîyewe
Germa û sebûn û lêzime û baran û terrîyewe

Roj baperrî û wirrêney şew raperrî û tekan
Bawêşkî lerz û ballefirrê û çoqeçoqî dan

Tirsî terîde pêşkeşî siwar, şew firrînî diz
Destiyawî barî kewtû le cêgay xilîsk û xiz

Erkî gizîr û xanebigîr, moryanî niwên
Bolley keybanû, kifrî qetarçî, pilarî ciwên

Çengsûtekey be aw, ke rûy nordiwe nanî kon
Cûte û leqey tewîle û hallawî ters û bon

Agirî tepalle, loksî gizgil, gefînî seg
Deste û yexey qetarçî le ser kaw, şerre kutek

Nûke şeqî qetarçî bo hellsan û peley
Loqe û tirîskey îstir û bazdanî cogeley

Lasengîy barwere bere parsengî xwarîyekey
Xo kewtî pêt le xirrke çû, lew deşte çî dekey?

Hêcgar ke afretit le teka bû, be tirsewe
Her siwarêk derkewê dellêy: Ay cerde ye ewe

Bac û pîtakî Zengene, gîrûgiriftî Caf
Herçîş ke hate pêş Hemewend birdî saf le saf


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bem kiwêrewerîye û kulemergîye û beçillkewe
Sêbende wergerraw, be ser û rîşî kullkewe

Emca deçûyte şarewe nawmallî ‘asîme
Bêt û binûsrêt nabête xwêy çêşt, eme kem e

Êsta siwarî otumbîl be, be sê se’at
Detbate ser qîtar û le Bexda yî ke roj hellat

Siwar be, binû, beyanî le xew heste zû be zû!
Bexda ye hat be pîrtewe, deybînî rû be rû

Caran eyanwit: Ewe welî ye teyyî erz eka
Pêçanewey zewî nîye, fenn e, karî berz eka

Înca ke hat birûske xiraye telêkewe
Hênraye xanuwewe le çiray her pelêkewe

Zortir le mangeşew der û jûr rûn kirayewe
Tarîkî la çû, têgeyînî ême mayewe

Carê ebê bizanîn emane le kiwêwe hat
Em xake çon le xwarewe wa rojî lê hellat?

Îtir ebê berraberîy zanistî têbigen
Çîtir le mane çaktir e bo berzêtî weten

Le lay min xwêndewarî ye, ah xwêndewarî ye
Her mîlletêk ke fennî nebê derdî karî ye

Ax xozge xwêndinîş weku min arezûyî dekem
Bibînim û nebête girêy qursî kifnekem

## Diwênê û emrro

Burcî rojî kurd ke rojhellat bû
Helman hellnekewt, beşman hellat bû

Qafiyey ekrad her bednîhad bû
Bûmî şûm le şiwên bûmman dillşad bû

Serçawey Dîcle le Diyarbekira
Hênd xwênî kurdî têkell ekira

Wek erxewan sûr ebû be lafaw
Pîrêjinî çerx eykird be sûraw

Ta Xuda way kird roj gerrayewe
Dadî hejaran pirsirayewe

Le rojawawe rojman bo hellat
Xûlî mexûlî biyaban hellat

Ellên katêk roj egerrêtewe
Dewrî zordarî ebirrêtewe

Ebê be dewrî Mehdîy ser zewî
Le ser ayînî xatim en-nebî

Peyrrewî Nebî dîmukratî ye
Dîmukratî ye, rû le hatî ye

Min bawerrim kird ke em ayîne
Awêne ye bo kurdî safsîne


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Min siwêndxwaranim boye xoş ewê
Em care firyay êmeyeş ekewê

Egîne min xom le kê dadime
Nan û kebabêk ser û ziyadim e

Mayey jiyanî ême ke ba bê
Bo neygorrimewe min be kebabê!

## Ellêm derçim

Ellêm derçim le dinya da, bike rehmê heta mawim
Le helqey zullfî şêwaw da, kewa gîrodeyî daw im

Nemawe hoş û eqllim, îxtiyarîşim le dest derçû
Be tîşkî rojî ruxsarit, serapa hellpirrûzawim

Le taw dûrît derûnim agirêkî tiya ye zerdeştî
Henasem bew girre wa germ e, her bew ahe sûtawim

Cefa pîşe! Ewa mirdim be zexmî tîrî mujganit
Le qebrîş da be nawî to mela tellqînî dadawim

Meken lomem le dinya da, kewa xom xiste dawî ’eşq
Eme fexrêk e bo mehşer le zumrey aşiq e nawim

## Em asmane şîne

Em asmane şîne kewa bergî matem e
Tehlîlî wa kirawe, ke qubbey xem e, tem e

Çerxêke kon e, makênekey jengî girtuwe
Çewrî neka be xwên, pekî sûrranî kewtuwe

Pîrêjinêk e, her şewey şûyek eka be xellq
Sûraw be xwênî mêrdî eka, pêy ellên şefeq

Gullgûn be xwênî aşiq e dêwcamey felek
Çingî pillingî nawete jêr qaqimî bellek

Gahê be xwênî "alî nebî" sûr ebê Furat
Gah xwênî kurdî têkell ebê Dîcle ziyad ekat

Serdarî ême, ke le ser dar be pêkenîn
Bangî ekird: Be kuştinî min mîlletim ejîn

Em xwênî kurde, ke weku xwênî siyawehş e
Xwênî nesênrê, helldequllê daîma geş e

Bo ême lazim e hemû sallêk, heta dejîn
Em rojî 24-î ayare bikeyn be şîn

## Em xake pake

Em xake pake, hênde lam çak e
Be sozî sewday dîdem nimnak e

Be temaşay dûr têrî lê naxom
Key demkêşête sîney xoy axum?

Min be ser ew da, ewîş le ser min
Be yektir şad bîn, be kiwêrîy duşmin

Le mew diwa eger êwaran yaran
Le dûm bigerrên, wam le kosaran

Karêzî şerîf demî berbeyan
Birîqey wêney sîney pirr beyan

Aramgay şoxî dîdemestan e
Rişêney firmêsk, meynetkêşan e

Le girdî yar e çawim lê yetî
Nazanim wêllî sewday kê yetî?

Ya Xuwa ew keseyî ke em dû salle
Lêm kewte gîze, wek zerdewalle

Neyhêşt agirî yare bigrrê
Çeqoy ahî min cergî helldirrê

Be neş'ey behar, lew mêrxûzare
Ko ebûnewe xellkî em şare


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Seyrî şîrînî willatiyan ekird
Daxî zistaniyan le dill der'ekird

Nîştiman be seyr dête ber çawman
Be hubbî weten berz ebê nawman

Min zewqî şîr'im, be çeşimendaz e
Şinoy beyanim, legell hamrraz e

Emewê Goyje û Ezmirr bê be rêm
Wek Qeysî Duceyl piya da bigerrêm

Legell ballinde û dirrindey yar bim
Wek taqtaqkere şewan bêdar bim

Her şiwênê xakî willat pirr nim bê
Her cêye şewnim şew le ser lim bê

Ewe cêy coşî giryanî min e
Ew zuxawî dilley biryanî min e

## Emrro..

Emrro ke rojî cejnî hemûmane ser be ser
Kurdîş legell gelan le çilexane hatine der

Sê sall bû rojû, rojî be salê le ber deçû
Rojûy heram bû, xêrî le ber şerr debû be şerr

Metbû' û tabî' wek Mem û Zîn bûn çi fayde
Gurg û çeqell le çiqllî "bekir mergewer" beter

Mîllet ne deng û rengî xelîfey edî û ebîst
Mezlûm çi heddî bû be şikat dengî bête der

'Alem ko bûbûwe xizmî xezûrî sepanî şêx
Kurd destî kurt bû! Nobeyê nobeyî nekewte ber

Herçî ke bîwitaye minîş kurd im ew deme
Rêgey Terablusî belûsî egirte ber

Te'neyan eda le kurd, ke şeqî n nabine welî
Ta şeq bû qebrî kurd û şeqey şeq geyişte der

Bêdestellat û lat û hetîw bûyîn le 'alema
Hîç careman nemabû, du'aman ekirde ber

Tîrî du'a, ke kurtî ekird, êste ser deka
Meydanî kurd ke kurt bû, bûwe deştî rey beber

Herçî bû, herçî hat be ser ew da be ser çû
Emrro be yekêtî ebê bestîn qed û kemer


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Rojêke dest bideyne destî yek wek bira
Rû bikeyne rêy selamet, derçê le naw xeter

Zor în be naw, çi faîde, xoxor û xudpesend
Bo ye kewa le paşewe mayîn, nakewîne ber

Bo xatirî Xuda bese em care, werin be dill
Ba yek kewîn, nemênê le beyna lekey keder

Welleh zekî în, sexî în, bewefa în, bêkes û seyr în
Ta key desindexor û geda bîn û derbeder

Hellsin le xew, nizîk e birrûxê dewar û mall
Xoman ebîn be bareber û, jin be kareker

Em nîştimane dayik e, ebê xizmetî bikeyn
Rizgarî keyn le jêr destî zordar be mall û ser

Rizgarîyekey be xwêndin û 'îlm û me'arîf e
Xwêndin çiray se'adet e, nûrêk e rahber

Êstake bo xelasî û azadîy kurdekan
Kobûnewe be şewqewe, merdanî namewer

Tedbîr û fikr û qiwet û mall serif neken hemû
Ta mîllet û weten le perêşanî bênine der

Êweyiş legell yeka be birayî bikewne yek
Çîtan biwê be yekêtî botan eçête ser

Xoyştan nemênin, nawe le tarîxî kurdiya
Botan ebê be yad û enûsrê be şaeser

## Epirsî çon in?

Epirsê çon in, leş û dîde û dill?
Dill jêr birotî kirdûwe be menzill

Tuxwa lêy gerrê le soz û tab da
Du'a gîra ye le jêr mîhirab da

Çawîş lafawî firmêsk zorî send
Pêll û gilêney le rîşe hellkend

Hajey ew, dillit daelerzênê
Heres zor berdî qurs ecûllênê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Estêrey bextim

Asmanekey! Cêy estêrey berz
Edirewşêtewe be şu'ley sed terz
Ew demey tîşkî roj eda le erz
Boç estêrekan dêne tirs û lerz?

Xuwa way kirdûwe roj balladest e
Mangîş le rûya zebûn û pest e
Eme teqsîmî rojî elest e
'Alem lem sirre gêj e û dembest e

Way tertîbdawe Rehmanî Rehîm
We fewqe kullî zî 'îlmîn 'elîm
Le rastî quwet ke nebî teslîm
Diyar e ekewye gêjî tirs û bîm

Destê netiwanî le bin da bîbirrî
Ebê bîşoyt û be xawlî bîsirrî
Ke wirç le ser pird rêy le to birrî
Ebê milwankey mûrûyî bo bikrrî

Em sallîş dîsan wa şeşî eylûl
Le Felestîn da kirdiye gerdelûl
'Alemî îslam dillgîr û melûl
Kurdîş be carê hatine cûlecûl

Hey supehirî pîr! Ew estêrane
Her yeke şanî her yekêkman e
Estêrey bextî minîş le wan e
Bîgorrerewe! Êskî giran e

Estêreyekî way le şiwên danê
Rêy siyasetî dewran bizanê!
Şewqêkî way bê gel pêy birrwanê
Nek karwankujey kurd bê û nadanê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Ew cejney

Ew cejney mîllet têy da kesas e
Min serim şîn e û bergim pellas e

Merr ser birrîne qoçî qurban e
Qurbanîy ême kiç û kurrman e

Ba girtin temî tirsim lê la ba
Birîndar nebê şêr hellmet naba

Kurrgel be galle billêyn be dujmin
Kewtin bo ew e û serkewtin bo min

Qurbanîy ême zor pesendtir e
Hî Hacî merr e, î me kiç û kurr e

## Ew 'eşqe

Ew eşqey legell cînsî beşer e
Be heway nefs e diwayî be şerr e

Xoşewîstîy Xuwa ke begyan bend e
Wek şerab wa ye, konbê pesende (1)

Ew sermestîyey ke le rûha bê
Dill awa eka herçend rûxa bê

Ke yadî Xuda hate dillewe
Be soz û nalle û coş û kullewe

Jengî dill legell firmêskî çawa
Pak ekatewe û eyda be awa

Dill pak bêtewe û jengî nemênê
'Erşî kirdgar yekser ebînê

Hay lew xoşîye û lew lîqay Xuwaye
Sellteneтêkî ew toy tê da ye

Şa, be sepanî xoy ranagirê
Tem rûy zemîne be filsê nakirrê

Enca ba xawen payey cîhanî
Bitwanê şanê bida le şanî

Ewaney ke wa be mesned bayî n
Legell çerx gorra, gişt çerxî "ba"-yî n


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xuwaye şukraney to tewaw nakem
Le sayey to we min ew bêbakem

Ke em feleke pêy dellêm: Welek
Şekirî çayîşim buwe be belek

Her le jûrewem hawîn û zistan
Herçî azaye bom bête meydan

Cilî hawînem koney zistan e
Ewîş hî xellke wa pênc sallane

Zor cilûbergî taze ebînî
Leşî leşpîsî tê da nihênî

Ke merg ew bergey lê ekatewe
Tateşor leşî pak nakatewe

## Ew xuwapêdaw e

Ew xuwapêdawey birsînewaze
Legell firîştey 'erşa hawrraz e

Bitewê legell Xuwa da xerîk bî
Ebê le piyawî bedkar terîk bî

Wirya be wek kiwêr be rê da merro
Dawî şeytan û çall zor e bo to

Le jêr seqfêk da în kollekey nîye
Ke rûxa, rûxa, rûgîrî çî ye

Em seqfe koney bêkolleke ye
Legell kollekey tu da, ta ke ye?

Têbige rêgay dûrit le bere
Çake bo ewla tiwêşûy sefer e

Xuwa fermûyetî: Rêy çake bigrîn
Bo êmeyetî, ke diwayî emirîn

Egîne le ber pêxember nebê
Çi îhtiyacî be ême ebê?

Barî gunahman ke kewte ser şan
Naçar în ebîn be kerî şeytan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Ey kiçîne

*Sirûd*

Ey kiçîne! Werine mekteb, êwe teskînî dill in
Zînetî bax û tereqî n, rewneqî destey gull in

Taze ême têgeyiştûyn, dayikî çakî xwêndewar
Esllî wa dênête meydan, qewmekey pê bête kar

Jin xerîkî jînî piyaw e, nek xerîkî berd û dar
Terbîyey mêşkî minallî bo weten bê û can nîsar

Xozge min bibime dirextê bo qutabxaney kiçan
Ew kiçaney wa dexwênin, bibime sêber bo ewan

Her kiçanî xwêndeware, mîlletî pê ser kewê
Terbîyey mindall hîwa ye, pêşrrewîman ber kewê

Rojhellatîş rojî helldê, xwêndinî kiç hate naw
Cehil e tarîke şewî kurd, xwêndinîş tîşkî hetaw

Derzî çall hellnakenê, fenn e weten awa eka
Xuşke giyanî dayikî muşfîq neslî çak dawa ek

## Ey mangî taze

Ey mangî taze spîhrî celal
Çend nukteyêkit pê billêm hesbul hal

Ta wek nîqab, mû, rût daneposê
Mebe be hawdem, herze û serxoşê

Hîç çiştê le dest hîç kes mestêne
Eger zanîwte, giyanî şîrîn e

Le piyawî bedkar xot dûr xerewe
Be we girewî çakî berewe

Nexelletabî dem bidey le şerab
Şerabe xaney to deka xerab

Cilî zerd û sûr mekere berit
Zînet nebête gêçell bo serit


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Ême ke kurd în

Ême ke kurd în le laman wa ye
Zubanî kurdî zor bêhawta ye

Lawikî kurdî dengî zebûr e
Cennetul me'wa le Şarezûr e

Selahedîn û Kerîm Xanî Zend
Baba Erdellan şay Koy Demawend

Qareman Qadir, fîdayî Fu'ad
Le rêy weten da be cennet bû şad

Gewrey hîç qewmêk wek gewrey kurdan
Le rêy weten da nebûn be qurban

Fîkrî mîlletyan îhya kirdewe
Qedrî wetenyan e'la kirdewe

Şad în ey mîllet bo em gewrane
Fexrî tarîxî layeq be wan e

Nawyan win meken be xas û be 'am
Ta ku deskewê rojî întîqam

Bêne cûllecûll, ba rohyan şad bê
Pêy mîlletekem le bend azad bê

Kiçanman le jêr beydaxî reş da
Çaw hellnehênin be xwênî geş da

Be xwênî lawan weten necoşê
Mîllet bo weten siya nepoşê

Hezarî wek min heta nekujrê
Be qellemî xwên şîwen nenûsrê

Em mîlletey kurd rizgarî nabê
Bê şik em îşe ebê her wa bê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Êsta xew..

Êsta xew boye nayete naw çaw
Cêy ew nemawe, pirr buwe le aw

Boye nayelê ke xew bibînim
Ba be xewîş bê nek ew bibînim

Dû çawim heye, yekê çawî ser
Ke bo rêgay dûr penay dête ber

Bellam çawî dill bo dûre menzill
Hîç manî'êkî bo nabê hasill

Eger ew perway çawî ser eka
Çawî dill hênde tîje ser eka

Min le Xuwam ewê ew xoy neniwênê
Wesill agirî 'eşiq dademirkênê

Lezetêkî wam le 'eşiq dîwe
Mullkî azadîm be we kirrîwe

Be 'eşiq azadîm bo hatote dî
Wesill namxate jêr barî maddî

Min be 'eşiq û ew be husin exurrê
Her ciwan e le şiwên 'aşiq egerrê

Eger Mecnûn û Ferhad nebiwaye
Leyla û Şîrîn çon ehatine kaye

Belê, ta 'aşiq rojî wek şew bê
Ebê beyanî rûxsarî ew bê

## Felsefe

Be cîhan ellêm: Sêberî eşkewt
Le wê da rêbwar serxewî ber kewt
Hellsa û boy derçû, hênde tiya nesirewt
Wa nebiwaye, çon cê ber to ekewt

Ax xozge guna bogenî ebû
Kes be lay piyawî beda neeçû
Ewsa be boney ew bogenewe
Pak û pîs le yek ciwê ebûnewe

Eger piyawxirap hat medhî toy kird
Le rewiştî xot lade destûbird
Diyar e be (labe) le rêt la eba
Wek kay naw xerman etdate ber ba

Min bewe zanîm piyawî tewaw im
Bedêkî nawdar ciwênî pê dawim
Nawîşî nallêm nîye lem şare
Dar helldebirrim, ew le wê diyar e

Nalî fermûye, diwanî bêedeb
Ewyan ewerrê, emyan eka seb
We xeleqnakum etwaren diyar e
Yekê bêdeng e û ewî tir har e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Felsefey şî'rî kurdi

Ebê bexşinde mil keç ka le rastî mûçexorî xoy
Surahî bo piyalle ser firo dênê ke tê ka boy

Ke aw darî le ser ser girtûwe eyzanî çî tiya ye
Le lay nenge ke perwerdey nuqum ka! Gewreyî wa ye

Liqî şorrî dirext mîwey dexon bê erkî berd û dar
Pellî berd bo pelî berz e, leqeyişe bo liqî berdar

Le dûrî durîya bêzar û bêziraw im emende zar im
Ecel dê bimikujê namnasê, çi bikem, namirim maw im

Le ber aşûbî xêllim hîç şewê xew nayete çawim
Xewî naxoş ebînim bem perêşan xawiye xaw im

Umêdî ser le ser derken ewaney rast û rûnak in
Qellem her ser qellem, mom bo meqest her bo eweyiş çak in

Ellên: Murxî Sulêman aw le jêr xaka ebînê şew
Minîş hew salle rê dûr bê be çawî dill ebînim ew

Çira rûnakî bo jêr xoy nîye rehmet le babî ba
Ewî rûnakî keçbînane, gorre rencî ba bîba

Be cût perwane û masî ke dilldarî çira û gol in
Nizîkî em desûtênê, le dûrî aw ewan hol in

## Feryadî Pîremêrd

Ellên firmêskî hewir baran e
Giwa ye giryanî şînî yaran e

Kiwa? Eger hewir wa bigiryaye
Eşiya baranî hîç newestaye

Çunke çiwar salle em serzemîn e
Têkrra be xwênî kujraw rengîn e

Ême ke xoman yektir bikujîn
Hewir û asman boç boman bigrîn

Em qirreqirre û qirrî însane
Rastit pê billêm fitî şeytan e

Xwastî Xuwa ye ebê bête cê
Bo ewey zemîn be fesad neçê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Gallte û gep (1)

Adar, behha, mangî do
Nîsan, seyran, nuxşey co

Ew mangey bûkyan tiya bird
Ew mangey kiçe şûy kird

Ew mangey kurrey tiya bû
Tewaw no mang be ser çû

Ewaney bêhewên in
Ser le xellk deşêwênin

## Gallte û gep (2)

Xo hellbestî em dewre
Le cêy xwêndin û dewr e

Cinokeman le dewr e
Bîsmîlla keyn be dewre

Dewrîyek pillawî çewr e
Wek kotir kewte dewre

Eçê bo piyawî gewre
Asmanî ême hewr e

Yekê bû yekê nebû
Lew diwane ewey nebû

Kerêkî bêgiwêçkey bû
Bo xoy bo kêşe eçû

Kere le dest xoy derçû
Îtir le nawa gum bû

Keçî ewey ke nebû
Kerekey firoştibû

Kerî xistibuwe herrac
Firoştî bê xerc û bac

Tifengêkî bêgulle
Dîzeyekî danûle


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Gunîye şirrêkî bênaw
Çeqoyekî demşkaw

Hemûy kirrî çû bo raw
Le ser serçawey Seraw

Herwa eyrriwanîye naw aw
Be sîhrî mela xinkaw

Wek awêney Eskender
Riwanî lew dîw tarîder

Wa çêrgê nîştotewe
Rû be rûy milekewe

Fîşekî naye tifeng
Hawîştî bê nalle û deng

Neygeyiştê û çêrgî kuşt
Xoy kewt le ser gazî pişt

Gunîye şirrî hellsûrran
Çêrgî şil şil tê çespan

Birdiye mallewe lêyna
Le naw dîzey bêbina

Le kullanêkî kema
Goştî royî, awî ma

Hênde siwêr û çewir bû
Herçî xwardî zikî çû

Herçî ke neyxwardibû
Çewrî lêwî bestibû

Ewey ke neyçeştibû
Be rîşiyewe meyîbû

Seg hat rîşî listewe
Segî girt be destewe

Ke kêşay be zewîya
Sed top bilûrî riya

Xawenseg û simêllçewir
Le yek kewtine şerre tewir

Heryeke bo xoy ebird
Ewan beşyan ne'ekird

Lew lawe qullçîy temwîn
Hat û têyxurrîn be qîn

Witî: Eme qaçax e
Le qaçax cergman dax e

Le dest ewanî wergirt
Be bêqirre beşyan kird

Boye pirsîn nemawe
Kewa beşkirdin baw e

Em heraye û gerdişe
Hî ewe ye bêbeş e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Gallte û gep (3)

Piyawê bû nawî Mela Sêpare bû
Destepaçe û ebleh û petyare bû

Xellk witî: Ba daneniîşê destbetall
Hanîyan kirdiyan be mamostay minall

Afretêkî bû, ketey çilşûkere
Demşirr û terrpîr û, perde la bere

Çopîkêşî reşbellek, berbûkî bûk
Dillbecêhêner, be mekir û nûkenûk

Çilqirranî bû, be mamanî û xelat
Bo Mela eyda be ker, karwan bikat

Parekey wergirt Mela, rûyî kirde şar
Dayî be giwêdirêjêkî rexteyî xercî bar

Zeng û kurtan û qerrazeyî bo kirrî
Siwarî bû qederê be loqe lêyî xurrî

Xellk û Xuwa lêyî kewtine gallte û hera
Hey Mela bûkê, kerî bo rêxira

Dabezî hewsarî beste qollî xoyî
Sê kesî çuxtî be tegbîr kewtine duyî

Hat yekêkyan kewte gallte û çendûço
Ta Mela hêcgarî xafill bû le xo

Dûhemîn reşmeyî le ser ker kirdewe
Xistiye ser xoyî lengerî bo girtewe

Her be pêwdanî kere hengawî na
Ta ewî tir hat kerî birde pena

Sêhemîn giwêdirêjekeyî dûr xistewe
Ker bira, hêşta Mela deyristewe

Piyawekey bûbû be ker xoy ratekan
Reşmekey xoy girt û hewsarî pisand

Mam Mela ew wexte awirri dayewe
Çawî kewt be piyawe hellwestayewe

Bangî kird: Min tom kirrî ker bûyî ke çî
Êste wa dû pêt heye û le piyaw eçî

Fingefing girya û witî min çî billêm
Wam le pêş çawit dezanî çî m û kê m

Diyar e însan im eger çî tund xûm
Şêt û cahîl bûm be gij dayikma deçûm

Rojê lêm dabû, du'ay kird bûm be ker
Çend le jêr barî girana birdime ser

Êste çawî kewte min, rehmî bizût
Wa du'ay kird bûme piyaw lût û bizût

Lat rewa ye êste barit bo berim
Zerr xirîdem ger çî ker nîm, noker im

Bawerrî pê kird, Mela pêy gut: Birro!
Qet be 'eqllî xot mebe îtir, xerro


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

Hîç dillî daykit merrencêne be şerr
Çon e? Lat xoş e hemîsan bibîte ker

Xoyşî çû bo mallewe û kifnî dirrî
Nîwerroh bûbû le tirsî demşirrî

Hatewe dê û pendî xoyî gêrrayewe
Kewte dem dê, sûkê dengî dayewe

Xellk be zewiyan hatewe, bar bû kira
Pareêykî zortirî bo rêk xira

Hatewe bazarr ker bikirrêtewe
Ew kerey dûbare çaw pê kewtew

Çû be giwêya gut be te'ne û lomewe
To dîsan xwardûte, min nayxomewe

## Galltey berrast

Xidir bû piyawî Hesen Efendî
Kes pêy nedegut: Kerit be çendî

Kiwêxa derga bû cêy xwacanişîn
Ferencîpoş bû zistan û hawîn

Rencberî mallê rojê nexoş kewt
Naçar ew roje bêgarî ber kewt

Pênc kerî ebird bo dêy Kellekin
Ke le ser xerman kay bo dabigirin

Le rê xoyî siwarî kerêkyan bûbû
Ke eyjimardin, her çiwaryan mabû

Witî: Ay xo min pênc kerim pê bû
Wa çiwaryan diyar e, ewîtir kiwê çû?

Dabezî û raykird yekser bo diwawe
Way zanî kere le diwawe mawe

Bo diwawey riwanî hîç diyar nebû
Gerrayewe lay keran zû be zû

Ke temaşay kird pênc ker tewaw e
Lem fendellfêlle serî surr mawe

Zor mandû bûbû dîsan siwar buwewe
Le berûjêre sereûxwar buwewe

Dîsan kerrwanî ker çiwaryan mawe
Girya û gutî: Min çîm lê qewmawe?


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Xoy xiste xwarê be du‘a û niza
Eparrayewe le baregay Xuwa

Du‘ayî gîra bû, riwanî ker pênc e
Rizgarî bûbû lem derd û rence

Îtir neytiwanî birrwa be pêyan
Xoyî helldaye ser kerêkî tiryan

Carê le rawêy lê hatewe dî
Witî: Em care ker gurg xwardî

Herwa lêyî xurrî geyiye nîwey rê
Berew pîrî hat xiley kiwêxay dê

Bangî kird: Kiwêxa! Le dewrit gerrêm?
Le kiwêwe Xuwa toyî geyande ser rêm?

Emrro cinoke galltem pê deken
Satê kerêkim edizn û eyben

Witî: Xidir Axa çend kerit pê bû?
Çendiyan mawin? Çendiyan le des tçû?

Witî: Pênc kerim hênabû le şar
Ke eyjimêrim, hatote ser çiwar

Kiwêxa tê geyişt ke xoyî û gêzer
Lêk nakatewe kabray qurrbeser

Ew kerey ke wa xoyî siwarî buwe
Çunku naybînê, le bîrî çuwe

Witî: Dabeze hey bendey bêxeş
Pêncî bo jimard xoyşî kirdî şeş

## Gelawêj edirewşêtewe

Oxey Gelawêj wa derkewtiyewe
Wek çiray bextî kurd serkewtiyewe

Yaney Serkewtin be to rûnak e
Kurdistan be rûy to ferehnak e

Şewqî dîdarit rûnakî çaw e
Îtir tewjimî germa nemawe

Guzergat burcî Dar el-Selam e
Diyarîy Jîn bo to du'a û selam e


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Girrûgallî pîrî çawgel

Çawî dillim hemîşe qeddî toyî edî be giyan
Mîwanî tîrî xoş e le la, xanexwêy kewan

Eger çawim be gerdî pêt birrêjim
Be firmêsk darî tûbay tiya enêjim

Çawî cadût dill eba, em hêze zanîwme çî ye
'Umrî birijangî dirêj eykêşê kotayî nîye

Çaw ke derdî dûrî tê kewt arezûy giryan eka
Nîwe mûyekîş ke kewte çawewe, ew jan eka

Çawî min serçaweyêk e sîhrî tê da karî ye
Bangke ye deştîş le çawim aw le wişkî carî ye

To le pêş çawim nemay, giyanîş le leşma derçuwe
Herweku awêne sûret la çû, 'eksîş la çuwe

Çawit ke be dûkell ekewê, xot meniwêne!
Ew dûkelle qirçey dillim e, agirî le şiwên e

Be çawî mestî hoşî lê fiirrandim, 'eşret hawar e
Nexoşî sax rût eka, bê hakim e, şêwawe em şare

Çawî to mor hellkenêk e, katê neqşî dill eka
Pêst û êsk û goşt le berya nerm e, xoy bo şil eka

Le dillma ta xeyallî çawî kalle
Hemû 'alem le pêş çawim xeyall e

Kaxezêkî spî ye nardim, tê bige me'nayî çî ye!
Çawî min bedreng e, spî ye, çunku çawî lêt nîye

Mizey ciwanît epêwa, bo min nebû ew cûte çawane
Be birjang leşimyan kun kird, buwe bêjingî pêwane


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Gîpe

Ehmed! Ba gîpet bo ew tîpe bê
Gîpet xward bê min, gupit gîpe bê

Xo min ew sate hatbûme lat
Tefre bo min bû, sifre bo cemat

Wityan: Kelleket hêşta deybarran
Wirgtan birincî kallî exûsan

Eger wek kelle mêşkit datekê
Ebî be wezîr firîşkit tekê!

Wek killawqazî bêdirûman î
Agirî bin dîze yî, zor bêaman î

Rîxolle çewrey le xot allawî
Pêçkey xot bestûwe le cê damawî

Herwek şîlawg hewênî şîr î
Le nuktey wirda, peykanî tîr î

Destî ‘îzzetit dayim le ser bê
Hermêy beheştit awdar û terr bê

Kirdey to û birdey nadîy Mezllûm bê
Xirapet diyar bê û çaket bin gom bê

Minîş keşkekim emrro xward bê to
Berdhawîştin e padaşî killo

## Goranîy mektebî kiçan

Ême taze têgeyiştûyn ke dayikêkî xwêndewar
Netewey wa dênête kar, mîlletêk eka risgar

Boye jin pêş mall xirawe, jin nebê mallîş nîye
Bellam ke neyxwêndibê, rêga nazanê çî ye

Jin hawbeşî jînî piyaw e, nek xerîkî potellak
Bexêwkirdin bew dirawe, le dayik e netewey çak

Pêxember xoy fermûye: Beheşt jêr pêy dayikan e
Bellam dayik ewane n ‘îlm û fenyan rewan e



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Gulleweçinî

Bulbul be gullî wit: Be lût û pût
Nazim kem ke, gelê gullî wek to pişkût

Gull witî: Rast e em te‘net, bellam
Key ‘aşiq emey be me‘şûqey gut?

Gullim dî le naw kullî mencella
Eyan kulland û girrî le dilla

Witim: Çît kirduwe wa etsûtênin?
Witî: Pêkenîm le ‘erşî çilla

## Hecî Pîremêrd!

Elifî miradit firrê da merdî
Şiwên mirad kewtî bo direm, mirdî

Rojû û nimazit ke bo niyaz bê
Wek aşiqêkî ke pîşey gaz bê

Niwêjî zor pîşey pîrêjinan e
Rojûş esllekey bo remezan e

Siyahetî hec seyrî cîhan e
Ewî be kar bê, bexşînî nan e

Kabe binaxey Birayimî Xelîl e
Dill nezergahî rebbî celîl e

Dill deşkênî û eçî bo kabe
Meço, mezalîm le ser xot la be

Min ziyaretî kabem kird, bellam
Ziyaretî dill pêştir e le lam

Le deştî Mîna qurbanî dekeyî
Bo gurg û çeqell diyarî debeyî

Lêrey ser birre û bîde be birsî
Debêt be qellay ayetul kursî

Dezanî kewa dinya fanî ye
Way degirî ta ser zîndeganî ye

Eger to ta ser her bijiyaytaye
Eşiya bo diway to cêga nemaye

Wek pêş to cêgay xoy dawe be to
Toyîş cêy xot bide be yekê û birro

Eger pê dagirî û billêy min narrom
Toyîş wek yarokan ehawne bin gom

Ke le ser piştî masî danrê
Tirrekellekê diyar e ser nagirê

## Hecûy espêk

Îbtîda boz le Siney kirduwe çera
Be leqe û cûte le jêr destî kera

Gû be gorrî piderî xêwî be rûy
Beşî kem bû, le kema hêzî nema

Hênde bêhêz e eger tawî bidey
Naşkênê le dewa hêlke be pa

Mehwe goştî bedenî ewsa ye
Piştî zînî dî weku hîzey ba

Bo derêy lê xurrî, narrwa be kutek
Rûberrûy pûş û giya dête sema

Deşkênê dehenî berdî zemîn
Hênd be ser sim ke le rê sucde eba

Wextî xar'eynî beraz e şeqîkey
Gerdinî nagerrê bo sûy qefa

## Hefse behare

Hefse behar e gull geşayewe
Awî Karêzî Şerîf jiyayewe

Harreharrî aw, xwêndinî bulbul
Sed bar pîrîş bê şewq eda be dill

Çiwale gullî kird, erxewan sûr e
Hêşta pişêwî le naw şar dûr e

Gulallesûre bûkî behar e
Minîş bo bûkêk dillim daxdar e

Befir û hellekok le min qewmawe
Gull be Tofîqî Hewlêr birrawe

Ta to û Fehîme xoş bin min her wa m
Ba wicûd heta demirim be temam

Neyse, bêynewe ser basî behar
Wa sewz bû sêw, hellûje û henar

Şing û helle kok pirçyan dirêj kird
Hêndem pîşok xward kellemî gêj kird

Darêkî zorim kird be bêllekan
Eydem be êwe bo bin gozirwan

Wa be xilexil nîsanekeş hat
Çar şêwî sewzî poşîwe willat

Sî û cigerî zistan dellên zor çak e
Bin tûwekeşman mallîwe û pak e

Şîş û miqellî û agirim danawe
Tematey sewzî parîşim mawe

Piştemexze û dûg, gurçîleş dênim
Herçî bîfirrênê qollî deşkênim

Bengoke û piyaz û kewer û terxûn
Le gell behara hemû peyda bûn

Sertiwêjî mast û penîrî taze
Hemû Bexdad boyî awatexwaz e

Êwey tiya nebin bêtam e û boş e
Ax a em bezme be to we xoş e

Şayî newrozim kird be naw û daw
Êwe diyar nebûn, lêm bû be zûxaw

Tuxwa û pêxemer! Besiye xerîbî
Ew ‘umre xoşe le gell ême bî

Wa be şiwêntana xom dême ewê
Lam wa ye Mîrza minî xoş ewê

Eger teşrîfî bêtewe êre
Ewanî êre ebine gay gêre!

Le sayey Xuwawe le kara yin, zor în
Mîrza gewre bê, xoş raebiwêrîn

## Hejar û stemkar

*Bo ew kesey ellê kurd qafiyey nîye*

Aman çend xoş e tafî mindallî
Bellam têy nagey, ta, konesall î

Le mindallîma ke bawkim sax bû
Gelê arezûy le rez û bax bû

Rez û xanûman le Gurgeder bû
Gurgane şewêm, zor çak le ber bû

Hawînan koçman eçû bo ewê
Ramanespard willaxman ewê

Wird û diriştiyan ehatine şiwênman
Lew diyare da, diyar bû şiwênman

Ekewtîne rê, berrîze û qetar
Be dengî şimşall, be beste û qetar

Le serî goyje hellperrkê û sema
Seyriyan ekirdîn firîştey sema

Lew benden da çopî û destbendî
Lew derbende da be naw Derbendî

Bem dîw bew dîwa, awazî şayî
Berztir le tepill û awazî şayî

Nizîk awayî tifeng eteqî
Etgut wa dllî bedxuwaman teqî

Dûr le serek û be azadeser
Le naw ewana emanbirde ser

Sallêkyan le pirr, îcare darê
Destdar, desberdar ta destberdarê

Ehatin rezî xellkyan exesand
Nek rez!! Xawenî rezyan exesand

Bêwejinê bû nawî Perwer bû
Çiwar hetîwî bû, hetîwperwer bû

Karî hatbûwe ser kirêkarî
Damaw û mandû, be derdî karî

Mêrdî ew jine, rezî naştibû
Berî lê nexward, xoyan naştibû

Rezêkî wêran le xwar awayî
Gellay zerd bûbû, wek xorawayî

Yekê le waney lay xoy danabû
Çiwar bar deyekî le ser danabû

Afretyan hêna, be pelrakêşan
Huqeyê tirêy nebû be kêşan

Noker lêy eda û, ew kirdiye hellda
Zordar gallî da, zoryan tê hellda

Le ber qsekey xergereşa bû
Şeqî şeqawet, le jin weşabû

Afret hawarî kirde xergerreş
Xistiyane derpêy pişîlêkî reş

Min giryam ramkird bo jûrî mizgewt
Zordar tîrî Xuway lê kewt, lewê kewt

Cewirî sitemkar ahî le diwa ye
Bedkar hemîşe karî le diwa ye

Ellên Xuwa diwayî tolle esênê
Em ewit qînî gillpe esênê?

Keçî wa le pirr ew tolleyey send
Bo xergerreş bû karî wa pesend

## Hunerî polî poyledaran

Xuwa lem behare da gullî ciwanî geşandewe
‘Eşqî ciwanî xoy le dillî min xişandewe

Polî kiçan le gell gullî deşt kewtine lencewe
Şewq kewte gencewe, dillî pîr kewte rencewe

Diwênê kiçanî mektebî Zehra weku zihûr
Yarîyan kird û cînsî letîf pirr bû hewş û jûr

Hefley jinan bû, Fatime ‘Elî ye mudîreyan
Razandbûnîyewe weku estêrey beyan

Xoyşî be nûr, ‘îsmet û fezl û qarewe
Xoş amadeyî dekird be tewazu‘ le xwarewe

Bîst cor huner tewaw bû stayişî tewaw nebû
Min her hîwam be wane ye boman bikewne rû

## Îdman

Îdmanî êste hatote ser bezm û xwardinewe
Herçî ke zorî xwardewe, başpallewan ew e

Bo neş'e û îştîha ye, ewende ke ker nebî
Lêre heram e, xot nexeye şîw û terr nebî

Ew cêge yarîye xoş e, ke çîmen bû serbeser
Êsta le şûşe şose ye, ke piya dekey guzer

Dayikî weten delê: Ke esîrî zemane bim
Bem kirdewey bede, be hîway çî emane bim?

## Kay kon be ba

Çawim ke rîzey danî toy bînî
Firmêskim riştey mirwarî honî

Ta bigrîm be dill rûnak ebimewe
Be awî çawî xom pak ebimewe

Çawim le dûrît egirya be kull
Giryan be zewî çawmî kewte dill

Ke agir dirrkî terr nasûtênê
Rehim be hallî terrî enwênê

Ellbete, Xuda rehmî ziyatir e
Bo ew kesaney dawênyan terr e

## Kiwêxa Remezanî Wirmziyari

Be wem zanî ke ahim karîger nabê be roj û şew
Henasem helldekêşim lekkeyê naxate ser rûy ew

Be xwênrrêjî le asin têperrî yarim be dillzibrî
Temaşa ken ke tîx xwênî errêjê xoyşî xwên egirê?

Be hawîn lêwî wişk û tînwetîy to hesret e bo dill
Bellam demirim bibînim lêw be lêwî to ye kasey gull

Le bê şîrîniya dem tall e xellk, (datillî) nema lay kes
Be (xanim giwêbegî) û (qadîn budî) min serfiraz im bes

Emend lam xoş bû (xanim giwêbegî) êstaş be tamî ew
Be xulyay pîre zawayî xewî şîrîn ebînim şew

## Kizey derûnî gişt kurdewarî

Xuda dad le dest em pîre zalle
Çend be ser dillî nazdara zall e

Hesen Beg le cêy dû paşa mall e
Dû çirayî hellkird lew binemalle

Bay merg yekêkî kujandotewe
Dillî ew êlley rencandotewe

Muhemmed serwer koçî bexêr e
Qoçî qurbanî qezawegêrr e

Xuwa rollemirdin be ecir ejmêrê
Yek be de tolleyî bo ebijêrê

Tarîx e bo ew nîkosiruşte
Muhemmed serwer pepûley beheşt e

## Konepoşî

Piyawêkî dartaş meymûnêkî bû
Bo hemû îşê le gellya deçû

Hogirî bû bo lay hellwestabû
Meymûn şagird bû, dartaş westa bû

Ke eygut teşwê, gurc boyî ehêna
Şeqqey mişarî bo dadehêna

Rojê westakeyî darî deqellaşt
Beyn beyn be piwaz lengerî edaşt

Be tewir darekeyî eqillîşandewe
Be piwaz lêkî errewandewe

Wextî nîwerro çû bû bo ser'aw
Meymûn hate cêyî wek westay tewaw

Xoy qît kirdewe, le cêy ew danîşt
Herdû gunî xoy be qillîşa dahêşt

Piwazî derhêna gunî pêwe bû
Kewte qîj û hûrr agirî tê berbû

Qillîşî cê piwaz yekdigîr bûbû
Hêlkey meymûnî tund tê çespîbû

Meymûn xeşîm bû, bû be faqewe
Deynalland be dem waqewaqewe

Le zîrrey meymûn xellk ko bûnewe
Çûne pêşewe lêy wird bûnewe

Hêlkey gîra bû le qillîşî dar
Denûzayewe kewtibuwe hawar

Westa le tawa ser'awî nekird
Hat piwazekey, lê da dest û bird

Meymûn risgar bû be kulemergî
Bellam êşekey geyibuwe cergî

Meymûn çon ebê be westay dartaş
Bulbul û leqleq nabin be yolldaş

Nagate payey merdî nahîsab
Nan bo nanewa goştîş bo qesab

Meşhur e dellên: Huştir û qezazî
Hewramî û siwarî, wirç û rimbazî!

## Kurdîy rewan (1)

Behar hat û derdê ebînim le gull da
Ewîş wa diyar e girr e wa le dill da

Ezanê ke wa pênc û dû roj e dewrî
Ke bawî nema, namênê kes le dewrî

Ke razandiyewe ser le niwê destî Yezdan
Hemû xellk be awatewen boy beyaniyan:

Be nalle û nizan, bulbul dax le dill e boy
Weku miştûmall jengî dill nayelê boy

Berokî ciwanan dest û ser e cêy
Bellê Xuwa ke day kê delê: To kêy?

Ke zadey çiqill reng û boy ciwanîy wa bê
Ebê rencî şewgarî bulbul be ba bê

Le diway em xoşewîstîye kutûpirr
Ke hellyanpiçirrkand û kewte ser agir

Le gell hellmî mencell ciwanaw errêjê
Be dem qullpî giryanewe wa debêjê:

Ke bêbayex e xoşewîstîy dirozin
Ke têr bû! Debînî firrêyday serûbin

Elay dulberê dulbere bayexî bê
Mepundar! Ke wa borepiyaw dayexî bê

## Kurdîy rewan (2)

Beyanî bû le xew hestam ke riwanîm befre barîwe
Silêmanî ellêy Bellqîs e taray zîwî poşîwe

Demêk e çawerrêy befrêkî wa bûm; mujde bê, barî
Serim befr e, keçî hêşta şerretopellim e bo yarî

Le bîrme şêrebefrînem dekird, siwarî debûm bê zîn
Nisê bû, cêgekey deybest, dema ta ku demî hawîn

Be bergî spîyewe çend xoş e şaxî Giwêje bîbîne!
Le rengî asman dillbertir e, em spî ye ew şîn e

Ellên: Bergî firîştey asmanîş spî ye wek befr e
Firîştey ême balla ye, bellam çî bikeyn le gell tefre

Hemû pêçekilloy befrêk firîştey Xuway le gell da ye
Firîşte kewte nawman, bo ye wa aşûb û hella ye

Ewa samallî kird û roj hellat, kewte gillezerde
Be ser ew befre da tîşkî hetaw ellmasî xuwakird e

Be ser gonay sipî da xişllî zêrrîne birîskeyî dê
Perî ser kêwî Qafîş hênd e pirçî zerdî xoy lê dê

Le ser serban befir tiwêjallî wêney çurrî şîr e
Qetarey ser liq û popî dirextîş spî ye dillgîr e

Çilûrey giwêsewan e, pillpilley zîwî kiçe kurd e
Seholl awêne ye; em pillpille û awêneye wird e

Ke pîrêjin ser û poyley be şînî çile têk alla
Behar dêt, darî pîr dejiyêtewe, dête qed û balla

## Lafawekey Silêmanî

Xellik le naw şîrînxewa nustuwe be pirxey germewe
Katêkî zanî ser aw kewtuwe le cêgey nermewe

Qaw û qîjî dayik û mindall û zirîkey bêkesan
Lirfelirfî aw, firrandin, ne‘retey xanûrûxan

Mallwêran, bêxanûman, ‘uryan û zistan pêpetî
Nahumêd û hîçnema û dîlî destî negbetî

Bo emane herkesê hoşêkî însanî bibê
Awî çaw, kîsey diraw dênête naw, şanî bibê

## Laney dillan (1)

Emwîst ew ‘umrem ke be ser çuwe
Bom naêytewe û lêm yaxî buwe

Tayê le zullfit bikem be kemend
Pêy bigêrrimewe û pêy bixeme bend

Çî bikem hey hawar pirçit birrawe
‘Umrim nemawe û cergim birrawe

Tuxwa hêllaney dill ke wa şêwa
Ba ‘umirîş, ‘emrî nemênê, birrwa

Yaxwa ew destey ew pirçey birrî
Her le xwêna bê, be terrî û birrî

Şî’rêkim dîwe gelê le mew ber
(Şane, tay zullfit derkêşê eger

(Qamîş ekutme pencey şaneger)
Bûy be “karî qut” hey xakim be ser

Egrîce katê ekewte ser rû
Şêweyî mangêkî gîrawî ebû

Êsta ke perde le ser rû la çû
Be bê perwayî abrrûy ro çû

## Laney dillan (2)

Emwîst ew ‘umrey ke wa royîwe
Bom nayetewe û le dest derçuwe

Tayê le zullfit bikem be kemend
Pêy bigêrrimewe û pêy bixeme bend

Çî bikem hey hawar pirçit birrawe
Daxim bû be dû, cergim sûtawe

Bellam hêlaney dill ke şêwa bê
Lêy gerrê ‘umrîş tefrûtuna bê

## Lasay tuhfey tufahî şa'îrêkman

Ew kiçe ciwaney ke Besêy naw e
Le "sînî"-î sîney ke zîwî xaw e

Dû sêwî tazey tiya danrawe
Le kirdewey Xuwa serim sûrrmaw e

Le qallibî nûr sêw darrêjraw e
Riyşey cergimî pêrra kêşrawe

Şêwey sêw lewhî Behzadî erjeng
Legell ew ballay, allay şox û şeng

Kewtote jêr tiwêy, zullfî şewezeng
Sîhrî hellall e, giyandar û bêdeng

Cîlwey le îca yedî beyzawe
Ew nûre giyanî minî kêşawe

Her le dest to dê, ferdî feryadres
Tuhfeyekî wa loks û enfes

Ke çî nejakê, be ser pencey kes
Le dûr errûşê, be şinoy nefes

Damaw im le rûy sun'î Xudawe
Ew sêwe giyanî minî kêşawe

Nemamî serwe û sêw muturbe ye
Mellên ew sêwe hawrengî be ye

Behêy rûzerd! Çon "daye"-y we ye
Tam noşdarûy kawisî keye

Çî bikem mar helqey le dewrî dawe
Rêy destdirêjî destim birrawe

Ellên beheştîş sêwî way tiya ye
Min tenya emem ewê lew Xuwaye

Ew sêwem batê her lem dunyaye
Hazir be qerizdan, lam narrewa ye

Hawar, zor ax û daxim kêşawe
Tasey ew sêwe giyanmî kêşawe

## Le debaşanîyewe bo Mela Necmedîn

Xeyallê wa le baxellma betwêy pîrahen e emşew
Be wesllêkî xeyall dewrim seranser gullşen e emşew

Hemû mûyekî endamim le xoşiyana xedengêk e
Eger aza ye xoy derxa ewey wa dujmin e emşew

Şkistî zullfî tobey pê şkandim; tobe lew tobe
Dillî şêx û milî mull têk şka, her bişkene emşew

Be sermestî ke destim kewt, le narî nar û nûr derkewt
Yedî beyza ye destim, boye dinya rewşen e emşew

Tecellî nûrî Tûr e bem tewre turrey ‘eşqî pîşan dam
Be perwazî cinûn cîlwem le wadî Eymen e emşew

Le dewrey Bêstûn dengî qullingî rohî Ferhad dê
Qewanêkî xeramefonî şoxî ermen e emşew

Ke giwêm ziringayewe ah, dengî zengî naqey Leyl hat
Ewa lew layşewe Mecnûn e degirî, şîwen e emşew

Sewadî turreyî morî Suleymanî suwa, yaxo
Weku bextî reşim rojî reşî ehrîmen e emşew?

Be ser şaxî Erarat da be lawik Pîremêrd serkewt
Ellê: Şiwênim kewin kurrgel, şewî serkewtin e emşew

## Le mewlûy pêxembera

Ey pêxemberî şîrînkirdewe
Ke'bet le jengî bit pak kirdewe

Xuwa mijdey daytê be keyf û meram
“Le tedxullennel mescîdel heram”

“Înna fetehna” ke sûrey feth e
Serapa hîway serberzî û medh e

Ew roje şêwey billindît niwand
Ke Mekket girt û Qureyşit şkand

Le Mekke da bûyt bê bak û bê kes
Bo Mekke û ke'be bûy be firyadres

Mekket le destî bedkar sendewe
Be we ayînî xot hellsendewe

## Le trenî rêy Estemûll da

Ewa rûm kirde to ey dayikî muşfîq bîstûpênc sall e
Le xurbet da be yadî to dejîm, Xuwa şahîdî hall e

Beyanî da nesîm lay to we hat, bonî weten pê we
Ewa nûsrayewe pîrane ser'umrim le ser niwê we

Ellên nefhey heyatî pê weye badî behar!! Wa ye
Be sirwey bay weten maw im behar û bay le lam bay e

Tren cûlayewe! Wa kewte rê, bawerr be xom nakem
Xew e yaxud xeyall, ya rast e, em hallî ferehnakem

Heway textî Silêmanî heye badî tren ba, bê
Bad ba bê le Şehba bê le Feyha bê le Zewra bê

Be çawma bê eger tozê le tozî bay Silêmanî
Ke nûrî Tore tûrê nayenê surmey Sulêmanî

Ke ba bênî gullêkî "kanîba" bênê le lam wa ye
Telay Keyxusrewî wek gencî badawer hemû ba ye

Gizingî roj edate befrekey şaxî 'Umer Gidrûn
Birîqey xoştir e lay min le durr û gewherî Qarûn

Be awatî dexwazin xellk te'amî maîdey Îsa
Le lam hellwa gezoyê nayenê destim kewê êsa

Seba dênête giwêm dengî minallanî qutabxane
Neşîdî mîllîyan lahûtî ye, qutî dill û can e

Umêdim wa ye em deste kurrane meş'elê hellken
Le tarîkîy nezanî da be zanistî weten derken

## Matem

Emrro, roy ro ro û şîn û matem e
Qubbey nîlgûn xumxaney xem e

Behar rûzerd e, rengî werem e
Hewir boman egrî, hêşta her kem e

Taze nemaman ser le gella ye
Tazenemamman ser le glla ye

Dinya germ bû, wadey sêber hat
Sêberî ême rûy kirde nehat

Ew royî bo xoy, cêgay beheşt e
Ême kewtîne şerrî kenîşte!

Dinya xirap bû, ta hat degorra
Cêy çakan nema, meger le gorra

## Mewlûdî pêxember

Îmrro mewlûdî pêxemberman e
Ew pêxemberey ke rehberman e

Xuwa fermûy eger tom şik nedebird
Çerxî eflakim dirust nedekird

Bo yekim nardiye ew ser zemîne
Billên: rehmetun lil ‘alemîn e

Diyar e rehmetî Xuwa her wa debê
Em dîne çakey lê peyda debê

Her le rojhellat heta rojawa
Çiray em dîney tiya hellkirawe

Eger dînekey wa çak nebiwaye
Çon em birewey dexiste kaye?

Tiflêkî bêkes, xoy nexwêndewar
Xuda bew dîne kirdî be serdar

Katê mu’cîzey Qur’anî niwand
Ayînî hemû mîlletî şêwand

Agir û awî kird be hereme
Herçî bo billêyn hêşta her kem e

Xuwa rêy siruştî le dest xoy nawe
Herçonî wîstî, her wa xulliqawe

Be ayey ‘edlî ke wa dêrrêk e
Muşrîkekanî hênaye rêge

Boç fexir nekeyn bew pêxembere?
Ke bo enbya her ew serwer e

Musillman ebê kirdewey çak bê
Musillmanêtî be qise nabê!

Ke “way ummetî” ew hate ber giwêm
Le şermezarî nazanim le kiwêm?

Heyf e, dîn em e û xoman bedkar bîn
Rojî şefa’et lay şermezar bîn

Ba lem roje da be çawêkî ter
Rohî Mewlewî bikeyn beraber

Hewrekey rehmet, rûy semay kerem
Sellat û selam key kem? Êsta kem

Bênê û birrêjê û bida be hemda
Be ser mezre’ey rohî xatem da

Cew mezire’ey nûr, coş da serew jûr
Kurdistan pirr ka le tofanî nûr

## Mizgewtî Xurmall

Çûme mizgewtî Xurmall be giryan
Ax jûrî reş û wêran û ‘uryan
Tehlîleyî buwe be çeke û kewan

Rêçkeyî bestuwe espêy murîdan
Her mallî Xuwa ye errwa be tallan

Asarî konî îslam rûxawe
Be callcalloke mînber tenrawe

Ta tûtin le şiwên îmam danrawe
Mîhrabî sîpallî tiya hellçinrawe

Xellik le ber bêgar hatûne aman
Dewrî eshaban sê mizgewt kiran

Yekê le Nigill duwem le Kirman
Sêyem le Xurmall mellbendî kurdan

Hersê binaxey Ewllay homeran
Asarî fexr in bo dewrî ewan

Sulltan Selîm goy şahî birdewe
Qubbe û minarey taze kirdewe

Qellayêkî kird bew ser girdewe
Serberzî xiste qewmî kurdewe

Şêx girtiye dest xoyî mullkî Xuwa û ewan
Ke şêxan tobey mirîd daeden

Ellên le mallî xellkî dest meden
Bellam ke cerde beşyan bo deben

Ellên xezwe ye, xumsî lê derken
Fitway bo eden be nessî Qur'an

Şêx be aşkira beheştfiroş e
Seraney mirîd hezar qiroş e

Mirîd sabrêne ellê bîdoşe!
Dewllet û mallyan hênde la xoş e

## Modey kon

Be ‘aşiqkujî nawî bednaw e
Tirsî lay Xuwayşî nawe be lawe

Xem û bezey hergîz nemawe
Xurrey firmêskim lay harrey aw e

Kispey henawim kizey kebab e
Nalley hezînim nexmey rubab e

Wa xeyall eka, le giwê coga ye
Mezey kebab û rubabî la ye

Çaw le çawyeka mestî enwênê
Be efsûnî çaw ‘alem enwênê

## Munacatêk

Xuwaye! Zîndegî bide be dillim
Hênde dillmirdû m bo xom xecill im

Min xom nazanim daway çît lê bikem
Her ewem ewê rêy lay to derkem

Şêtî wa heye şeq eweşênê
'Aşiq e û şêwey şêtî deniwênê

Min dêwaney tom be taqî tenya
Wa şeq hell'edem le herdû dinya

Ew roje xakî leşit darriştim
Tozê le lîqay xotit tê xistim

Wa bew mayeye geyiştime meram
Tenya tom ewê, beheşt peşm e lam

Ewey be mallî dinya bayî ye
Çawî le genc û padişayî ye

Pîşe û hellkirdî min gedayî ye
Meylî to bo min şayî û şayî ye

Ezanim minit bo xot dirust kird
Bedî û hesûdît le dillim la bird

To bot danabûm min beşî xom bird
Kewa bû hîçman ziyanman nekird

Xot le Qur'an da wehat fermû bû:
Redîye llahu we redew 'nhu

## Nalley pîrî pîran (1a)

Ey bexşayindey xawenî ‘eta
Ey xudawendî poşindey xeta

Ey bêniyazî tewaw nenasraw
Ey tenhay nawdar hezarûyek naw

Ey destellatdar! Dest nagate to
Ey perwerdgar! Hanay gişt be to

Neş’eyê bide be giyanî mirdûm
Rûnakî çawî hewa kiwêr kirdûm

Xuwaye nazanim çîm le to biwê?
Herçîm bideytê min ewem ewê

Perwerdgara! ’Uzrim pesend ke
Le rastî gunah cillewim tund ke

Hemû ’umrî xom, xom dam be ba da
Hêştaku şeytan yexem bernada

Bûn û nebûnim le la yeksan ke
Le wextî xem da şadîm asan ke

Xuwaye! Etirsim le gunahî xom
Destim rakêşe destewsanî tom

Xuwaye xumarî tom wa le ser da
Şî’rî supasî tom wa le ber da

Ser û zimanim be fîkr û senat
Her wa bêllewe heta dême lat

Nengî dinyayî le lay min xoş e
Be nengî lay xot min dameposçe

Serim be sewday ‘eşqî to gêj e
Xakî rûzerdîm piya da mebêje

Xoşwîstinî tom hellbijard bo xom
Le rêy rezata her wa bellacom

Gemîyekey Nûh birrexsêne bom
Le gêj serkewim, nekewme bin gom

Perwerdgara! Herçît hellbijard
Xermanî hestî ewit da be bad

Bewe muflîs in xellik ke niyane
Min be bûnî zor mallim wêran e

Fezllit bê keran, şukrit bê ziyan
Xeyrî to kesim nîye le cîhan

Xuwaye ew kesey ke to enasê
Kesî tir nakirrê be lete dasê

Meylî to wa bê biçime cehennem
Beheştim nawê be reza, bendem

Xuwaye! Danam ke, nek danay bedhall
Bînayîm berê, pêy nekewme çall

## Nalley pîrî pîran (1b)

Xuwaye! Hawarim tenha be to ye
To nebî ‘alem be çillûço ye

Dû ballim berê ke pêy bifirrim
Ballî dû teyrî nehsî pê bibirrim

Yekê kolarey tema‘î negbet
Yekê sîsarke keçelley şehwet

Eger em duwanem tiwanî ball şkand
Nêçîrî merdîm le dinya firrand

Xo eger her wa em diwanem siwar bê
Ebê nawî min kerî jêr bar bê

Xuwaye! Wa min xom tema‘im nawê
Fermû ew wazim lê bênê tawê

Rû bikate şiwênê ke eyanewê
Şew û roj dillyan bo ew nasirewê

Tema‘ pareyan pê ko bikatewe
Heta le toyan dûr exatewe

Le pirr merg hallî dinya egorrê
Xo diyar e pare naçête gorrê

## Nalley pîrî pîran (2)

Perwerdgara! Dillêkim ewê
Ke agirî hewa rêy tê nekewê

Abrrûyekî bêzirq û riya
To, to binasî û padişa, geda

Xuwaye xwastî to be beha nîye
Derkirdinîşit be behane ye

Eger lêm pirsin, qartêkim nîye
Nayişzanim mayey bendegîm çî ye

Înca ke wa bê çon egeme to?
Kewate be xom billêm rencerro

Dîsan min le to nahumêd nabim
Be Xuwam nasîwî her debê ça bim

Eger pêm billêy meyke û pêm bikey
Destellatî min çon jûr xot exey?

Kirdewey minit xot qerar dawe
Îtir arezûy min le kiwê mawe?

Rohim be rezay towe suruşt e
Arezûy nefsim horî beheşt e

Lîqay to ke xoy be roh enwênê
Îtir arezûy nefsim namênê

Le cehennem da be yadî to we
Gullî beheştit nakem be bowe

Xellk wa dezanin nûr ‘îbadet e
Nazanin dadit be ‘înayet e

Zorman bîst ‘abîd be gumrra derçû
Safdill pesendî lay baregat bû

## Nalley pîrî pîran (3a)

Xuwaye! Be xîred rêm pê nebirdî
Pîrêjnane birrwam pê kirdî

Diway ewey zanîm kewa to Xuda yî
Bo bêkes kes î û bo damaw pena yî

Îtir zor wirdî naxwênimewe
Destrazey hîkmet nahonimewe

Çunku pêxember ‘eqllî kulî bû
Keçî le rast to ‘eqllî kullî bû

Qabe qewseynî ew edna ledeyk
Fermûy: La uhsî sena’en ‘eleyk

Namewê kunhî zatit bizanim
Le bizurgît da mat û heyran im

Bellam emewê be sozêkî ‘eşq
Xoşewîstîy tom bibê be sermeşq

Sermeşqî ‘eşqî penhanî wa bê
Kes pê nezanê û tom le dilla bê

Ew sengteraşey le kêwî Tûr bû
Be ‘eşqî towe le ‘alem dûr bû

Eygut: To were lam be mîwanî
Eçû le lay şiwan şîrî dehanî

Hîç nebê nallêm wek min newsin î
Eyişzanim dayim mîwanî min î

Ye'nî hazir î hemîşe le lam
Bellam min bo newis le to tewellam

Tuxwa to herçend ke lamekan î
Ke bo xaney dill teşrîfit hanî

Fermû heç kesî tiya ye ba hestê
Noker çon le lay axa ewestê

Îza ca'el heqqu zeheqel batîl
Zaxawî dillî pê debê hasil

Ew zewqey nûrî me'rîfet eyda
Gencîy rûy zemîn pêy nabê peyda

Yaxuwa be badey 'eşqit serxoş bim
Ta eçime jêr xak mest û medhoş bim

Min ke le zewqî dinya mustexn îm
Îtir be lîqay meylî to dejîm

Kes le qapî to na'umêd nabê
Ba em hacetey minîş rewa bê

## Nalley pîrî pîran (3b)

Xuwaye! Em rêyey minî le ser im
Şeytanî zor e û xeter le berim

Pêşekî pena dênime ber to
Ba nebime bawkim, xerro rencerro

Sed gunahkar bim, ke to lêm burdî
Bo to lezet e û bo min rûzerdî

Be tawanî min pêxemerekem
Şermesar ebê le we; sill dekem

Perwerdgara! Le ‘esllî çaka
Hîç kes be Xuwa hîşt gunahê naka

Ke to netewê parêzgarim bî
Min be nakesî nabime darî bî

Xuwaye be dar û be berdima bide
Le gell dostî xot beynim têk mede

Herçî dostî toy newê zelîl e
Bo eme tebbet yeda delîl e

## Nalley pîrî pîran (4a)

Perwerdgara! Temaşa ekem
Xom le kirdewey xom haşa ekem

Dill û zubanê to dawte be min
Be hewa û hewes lêm bûn be dujmin

Emewê dillim tenha toy tiya bê
Le yadî xeyrî to tewella bê

Ewsa zubanim zîkrî to deka
Etwanim bibime bendey barega

Egîna her wa bimênimewe
Towî bednamî eçênimewe

Çend xoş e neş'ey tom le dill da bê
Şeqim le çend û çûnî helldabê

Azad e ser wek berzekî banan
Bikewime sewday arezûy canan

Tacî edhemî binême ser ser
Fermanrewa bim le behr û le berr

Yaxu perwaney nûrî lîqat bim
Rohim perwane û xoyşim fîdat bim

Zor kes perwane n bo şem cemalê
Ba minîş bibime şiftey cemalê

## Nalley pîrî pîran (4b)

Perwerdgara! Ewaney danan
Canyan ebexşin bo meylî canan

Arezûy nefsî xoyanyan nawê
Ta meylî toyan deskewê tawê

Rabî'e ke wa pêy ellên jin e
Watey merdaney ewim le kin e

Elê: Beheştim be beş ber kewê
Bizanim rezat dozexî ewê

Bo ewey meylî to bênime cê
Eçime cehennem bo xom dest be cê

Eme meqamî berzî reza ye
Bexşînî tenha le dest to da ye

'Eqll û me'rîfet dabeşî to ye
Hemû hî to ye em reng û boye

Em nexşe ciwaney giyay ser zemîne
Destkirdî to ye ke wa rengîn e

Kewn û mekanit hênaye meydan
Ke çî nawî xot nawe "la mekan"

Min ezanim to le hemû cê hey
Ême debînî û hîç xot dernaxey

Bûyî û heyî be bê zeman û mekan
Cillewî be dest towe ye cîhan

Ma esabeke deygêrrêtewe
Îradey to kes naygêrrêtewe

Herçî hengawê nizîkit kewê
Nûrî rehmetî toy ber dekewê

Ewey keremit le ‘ebd enasê
Diwayî be petî bendet etasê

Ewî to bîdey ba bişllên kem e
Be bereket e, mûçey sercem e

Ewî to neydey be nesîb nabê
Eger keremî mexsûsî şa bê

Çend xoş e însan heqîqetco bê
Be şewê tenya her le lay to bê

Ay lew lezete û lew zewqî rohe
Ay lew neş’eye û hay lew fitûhe

Tû xuwayetî xot wam lê bike wa bê
Neş’ey penhanî tom le dilla bê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Nalley pîrî pîran (5a)

Perwerdgara! Wa bere bere
Sewday nasînî tom le ser ser e

Dillim hemîşe rezay toy ewê
Giyan le bedenma satê nasrewê

Eger le xakim giyayê birrwê
Be zubanî hall le zîkirt edwê

Her makîneyek ke giwêy lê egirim
Ahengî zîkrî etoy lê degirim

Mestêkim parey ‘areqim nawê
Sard nabêtewe dill be hîç awê

Çend xoş e le toyî perdey nîhan da
Şew nûr ebînim le asman da

‘Eynî tecellî agirî koy Tor e
Em nizîktir e û le Şarezûr e

Kesê nizîk bê be bendegîy xoy
To nizîktir î le cismî xoy boy

Xellkî be ‘eşqî husnî şêt ebin
Lîqay to wicûd derdênê le bin

Ke wicûd nema, ca nobey can e
Can cêy tecellay cîlwey canan e

Her cê ke qortî rohî tiya nebê
Bê tam û kam e, lay be! ba nebê!

## Nalley pîrî pîran (5b)

Tenha Xuwayekey zewî û asman
Le hemû şiwênê peyda yî û penhan!

Le bendegî da be we serberz im
Ke le dîwanî to da elerz im

Oxey çend xoş e ke radewestim
Carcare be şew niwêj dadebstim

Elhemdu exwênim rû le to dekem
Be paşmleyî supasit ekem

Ke geyiştme ewey billêm îyyake
Be neş'ey hizûr dillim rûnak e

Çunke ew deme wam le hizûra
Dillim eşorê le deryay nûra

Eçime lay piyawêk ke wa gewre bê
Ebê wîzîtey be entêre bê

Xo eger wek min cilî çillkin bê
Be rîş û simêll çehrey kullkin bê

Le lay ferraşîş her derkirawe
Her qapî to ye ke negîrawe

Be endamêkî pirr gunahewe
Bo niwêj eçête rîzî şahewe

Min ke nizîkîy lay tom dest kewê
Le burdebarî bendet çîm ewê

Xuwaye wam lê bike agam le xom bê
Kewtim Ellahe her le gell tom bê

Ne wek be zuban du'a bixwênim
Le dill da regî xellkî derbênim

Ke to herçît kird be çakim zanî
Destim maç eka xoşguzeranî

Be rezamendî dillim pirr coş bê
Herçî to bîkey ewem pê xoş bê

Eger şêtî bê şêtî tewaw şêt
Xak û xar û zîx ekewne ber pêt

## Nalley pîrî pîran (6a)

Perwerdgara! Cezbey to nasîn
Be demax ebê, xo ême kas în

Ta to xot destî bendey xot negirî
Neyxeyte ser rê û têr û pirr negirî

Be firmêskî çaw dillî neşorê
Bergî xudbînî û nexwet negorrê

Wek siruştî xoy, xoy neka be xak
Xakesar nebê be dillêkî pak

Barî bendegît be giyan nekêşê
Be êşî qewmî dillî neyêşê

Perwaney nûrî lîqay to nebê
Be hemû xwastit rezaco nebê

Nalley şewanî negate dergat
Giryey terr nekat perdey baregat

Be badey yadî to sermest nebê
Gahê pirr cezbe û gahê pest nebê

Nagate rêzey bendey fermanî
Naçêjê neş'ey lîqay yezdanî

Xuwaye em hallem wa ewê le to
Qelenderê bim rend û bezlego

## Nalley pîrî pîran (6b)

Perwerdgara! Eger her mûyê
Zibanêkim bê, şukran e goyê

Şukrî ni'metî to tewaw nakem
Le çît siruşt dam min her ew xake m

Ew zubaney min şukrî pê ekem
To pêt bexşîwim bê ziyad û kem

Xuwa! Sirrî xom lay her kesêk gût
Xomî pê sûtam wek serebizût

Her to yî mêrûleyiş razî be to ye
Sûtawî şewqit, sazî be to ye

Dergay bizurgan be şew dadexirê
Qapî to be şew hanay bo debirê

Gewrey diniyayî destî biçûk egirin
Bew çakeye xellik le beryan emirin

To xudawendî ke xellqit kirdûyn
Şeytan gewreyî toy le yad birdûyn

Le gell eweyiş da her to bexşnde yî
Nanman nabirrî, keremkunende yî

Xuwaye pêm xoş e serim bibirre
Perdey namûsim be xellik medirre

Xot eyzanî xellk çend bêmirwet in
Helyan bo hellkewt çend kemfirset in

Be sikî birsî damnê le ser berd
Bellam memxere dest piyawî namerd


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Nalley pîrî pîran (7)

Xuday bêniyaz, bêxwêş û hamrraz
Be dû xullkî çak bimke serfiraz

Yekêkyan emey xerezim nebê
Le rastî hîç kes ‘ewezim nebê

Kes le kirdewem ziyan nebînê
Dillim jeng negirê be buxz û kînê

Herçî derbarey min bedendêş bê
Be tîrî qehrî to dilley rêş bê

Duwem qena‘et, le az azad bim
Herçîm bideytê be we dillşad bim

Ke bêniyaz bim le ehlî dinya
Her to denasim be taqî tenya

Ewsa bo hîç kes nabime teşîrrês
Le hemû mallê nabime kaselês

Le tonasîn da Xuwaye zor kas im
Hoşêkim berê toy pê binasim

Her to rehberî le karî çaka
Bedîş xom neykem, hîç kes pêm naka

Eger xirapem be emrî to bê
Çon ebê cezam dîsan be to bê?

Haşa îsnadî zullim be to nadem
Nefsim nayellê le gunah la dem

Xuwaye mertebey rezam biderê
Le dewllemendî û gedayîm gerrê

## Nalley pîrî pîran (8)

Xuwaye ewaney ke bêbawerr in
Hîçyan nedîwe her hellewerr in

Egîne seyrî baxêkî gull ken
Temaşayekî be giyan û dill ken

Ew renge ciwaney perrey hercayî
Be zerre bînî tîşkî bînayî

Lêy wird binewe ke ew sen‘ete
Kê dellê zadey xoy tebî‘et e

Tirazî pesend kam meqest birrî?
Perde ‘urûsî kê perdey dirrî?

Kê hat lawlawî be dara alland?
Kam dest gerdinî wenewşey çemand?

Emane berca billêyn bêgiyan in
Madeyek rûy da zor kes eyzanin

Şîwe kellyekan axayekyan bû
Nawî Axal bû le pillng eçû

Pêyî birîndar bû lêy kird be xore
Zor hekîm hatine serî be nore

Rojê Mewlewî hekîmî bane
Pêy wit: Rehim ke bem mindallane

Em derde pîse etenêtewe
Piyaw ebê le xellik dûr  kewêtewe

Axal le jûr dê çuwe bin darê
Rakişa û riwanî boy kişa marê

Emîş bêzar bû çawî lê qûçand
Mar hate ser pêyî xoy bo necûlland

Xellik û Xuwa geyine serî ber û diwa
Ta ewan hatin mar pêyewe da

Pêy çak buwewe, wek doxî carî dî
Xo nallêyn emîş tebî‘et nardî

Berdezilekey naw zêy ber Dûkan
Ke bo biwarî aw buwe be nîşan

Şare mêrûley le naw da ejî
Emîş tebî‘et hênawyete dî?

Em asmaney ke bê stûn e
Bo kirdewey to buwete nimûne

## Nalley pîrî pîran (9)

Xuwaye! Fermûte xot le Qur'ana
Le peristişî cînn û însana

Xelqî cînn û îns bo ‘îbadet e
Peristinî to rêy se‘adet e

Hedîsî qudsîş herdû yek bas in
"Kenzî penhan bûm, wîstim bimnasin"

Ew bo ‘îbadet, em bo nasîn e
Em dû awêne bo yek ayîn e

Xeleqtul xelqe lîkey 'u‘refu
Bo kê dest eda herwa zû be zû

Sa meger riştey hîdayetî to
Bo ew rayelle bê be tan û po

Egîne bêt û ew rêy rehmete
Nuqtey bête ser diyar e zehmet e

Tuxwa! Ba rehmet nebê be zehmet
Nebîyit be rehmet narduwe bo ummet

Diyar e muhtacî du‘ay ‘ebdit nît
Eger netnasin, to derbestî çît

Ezanim bo çî wa lutif enwênî
Destnêjî xotin nayanşkênî

Diyar e aw xellqî perwerdgar e
Sîfetêkî way lêwe diyar e

Ew darey ke xoy hênabêtye ber
Nuqumî naka, eyxate ser ser

Dîsan fermûte ke perwerdgar
Zor le lay xoş e ‘efûy gunahkar

Bizanê zewqî ‘efûy min çend e
Gunahkar ebê be ‘emdî bende

Xo min nawêrim eme bênime dî
Egîne minîş ‘efûy tom edî

Bellam ewîşe behsêkî ciwê ye
Ew piyawey le we biga le kiwê ye

Min le manem çî, pîrêjnane
Etnasim, naçime ser giwêsewane

Min emem bes e heta ku demirim
Zewqî ‘aşiqî yadit wergirim

Xoşguzeranî be dillxoşî ye
Allan e dinya, feramoşî ye

Dinya dawêk e kewtîne nawî
Dînman exeyne be hawpênawî

Hedîs e dinya û dîn yek nagirin
Her laye layê le yek daebirrin

## Nalley pîrî pîran (10)

Xuwaye! Min zo rcar dême ser ewe
Emey deybînim pêy billêm xew e

Hemû kirdewey to ‘edalet e
Hemû dewrêkîş zallim alet e

Ta yekê nedey be kuşt be wî tir
Kes kursîy cahî bo nabê îtir

Ta leqe neda be dar da yekê
Tû bo ewaney jêr dar natekê

Be dîmen eme ‘edalet nîye
Bellam be me‘na keçî dîdenî ye

Ême tê nageyn le esrarî xeyb
Her xot eyzanî hakimî bê‘eyb

Xeyrî to hakim kê ye daîm bê
Ta ebed le şiwên xoy da qaîm bê

Hemû hakimê tabi‘î emr in
Ya ‘ezill ekirên, yaxu her demirin

Kes le to naka û to le kes nakey
Ew xudawendey gewre bêba key

Ezelîyyetit seretayî nîye
Ebedîyyetit muntehayî nîye

Şiwên ezel kewtîn, her ser berew jûr
Gerdî rêgeyişman ne'edî le dûr

Gerraynewe ser ebed serewxwar
Le rê da gum bûyn, kewtîne hawar

Dad ledest sirrî 'îlmî îbtîda
Bê dad le riştey lûlî întîha

Kewa bû ême rexney çî bigrîn
Ême nazanîn xoman key demirîn

Ke zîndegîman be emrî to bê
Pîşeman boçî her çillûço bê

Lutif derbarey xirap biniwênî
Mallî hejarî pê birruxênî

Eger bêt kesê billê çî dekey
Be zallim ellêy têy hellde, sa dey!

Mall mallî xot e û bende bendey xot
Çî dekey bîke, xo liwawe bot

La yus'elu buwe be qifllî demman
Helldekeyn le gell şi'uî kemman

Bellam xot serman bişkêne be berd
Memanxere dest hetîwçey namerd

Pîrêjin ellê: Xuwa xetapoş e
Herçî lay Xuwawe bêt pêman xoş e

## Nalley dilltengî

Em qewmî kurde, eger tê nega
Bo xayey mîllî, rû le kiwê deka?

Sergeştey çoll û biyaban ebê
Nagate hewar, mallwêran ebê

Ta yek nekewîn rêga dernakeyn
Ebê yek kewîn, weten awa keyn

Em xake nawî xakî Êraq e
Le ser zemîn da, bêmîsil e û taq e

Ewey xirap e qedrî nazanîn
Çunke gîrodey cehl û nezanî n

Eger be xwêndin le xoman negeyn
Wek ker, kirêbar bo xellkî debeyn

Eger detewê karit mehkem bê
Nexwêndewarit debê zor kem bê

Îqbalî ummî girr û dewrêk e
Ewîş nîşaney pelle hewrêk e

Ta sewîyeman tewaw berz nebê
Pelupoy îlim û fen sed teriz nebê

Mêrûle bo xoy kird û koşiyetî
Kurd gird û xulî bêhoşîyetî

Da'im legell yek şerrman e û hera
Hello be tîrî perrî xoy kujra

## Neşîdî matem (1)

Ewa payiz e, gullistan rengî zerd e
Gellay dar werî, bay seher ahî serd e

Perrinde le herde
Dillî pirr le derd e

Perêşan e sunbul, çinar bergî lûl e
Gullî qehqehe mat e, mîna melûl e

Çi ‘alem şimûl e
Em eylûle xûl e

Dirextêkî tûbay beheştî Êraq bû
Le me’wa ye me’way, ke sayey be ser çû

Dirîxa le dest çû
Bellam zû be zû

Liqêkî billindî le cê û, cêy hîwa ye
Weku esllekey sayebanbê Xudaye

Ke dallde û pena ye
Wedî’ey niya ye

Ke bellku Êraq, wek Êraqî ebbasî
Beheştî zemîn bê, be lale ebasî

Billind e esasî
Nebînê kesasî

Be ‘îlm û finûn, bê be dewranî Me’mûn
Ferrense dîsan peyrrewî bêt û meftûn

Hemû şad û memnûn
Weku ehdî Harûn

Ke êmeyiş newey fazîlî ew zemane în
Ebê ser kewîn, ta bizanrê le wane în

Le bapîr nîşane în
Fîdayiyekaneyn

## Neşîdî matem (2)

*Le ser weznî beharan çi mehzûn*

Behar matemî kewte naw, rengî zerd e
Be giryan e hewir, bay seher ahî serd e

Perrinde le herd e
Dillî pirr le derd e

Dirextêkî tûbay beheştî Êraq bû
Le me'wa ye me'way ke sayey be ser çû

Dirêxa le dest çû
Le new ciwanîya zû

Liqêkî ciwanî le cê û cêy hîwa ye
Weku esllekey sayebanbê Xudaye

Pena ye û hîwa ye
Le bincî niyaye

Ke bellku Êraq, wek Êraqî 'ebbasî
Beheştî zemîn bê, be lale 'ebasî

Billind bê esasî
Nebînê kesasî

Hemû ême bend e û newey ew zemane yîn
Ebê pêş kewîn ta bizanrê le wane yîn

Le ecdad nîşane yîn
Fîdayiyekane yîn

## Neşîdî zanistî bo newroz

Emrro newroz e wa gull peyda bû
Le 'eşqî gull da bulbul şeyda bû

Bulbul le ser gull mangî bebang e
Xwêndinî ême sall diwazde mang e

Ew tenha bo gull serder hewa ye
Ême serberzîy qewman hîwa ye

Bulbul le 'eşqî gull da be soz e
Sozey ême bo daykî dillsoz e

Bulbul le bergî gull peyda nabê
Ême lem xake în, ya Xuwa awa bê

Bulbul detorê, çon bêwefa ye
Ême rîşeman lem xakeda ye

Bulbul derrencê be cefay xaşak
Ême bo sucde ser debeyne xak

Wa daykî weten hat û defermiwê
Min nexmey rolley zanistîm ewê

Çunke zanistî cêgay hîwa ye
Mîllet be zanist le birew daye

Zîrekîy ême legell zanistî
Eger yek kewin, nakewne pestî

## Newrozaney Nesrîn û Perwîn

Par dête bîrim wek xewê
Ke dîbêtim pêrê şewê
Min sallêkî tazem dewê
Ke kurd beharî ber kewê
Wetenman pêy bê be gullzar

Mijde bê sall gerrayewe
Agirî newroz kirayewe
Befrî zistan tiwayewe
Giya û gull û dill jiyayewe
Nuxşeyiş bê le kurdî hejar

Gull le baxa xoy deniwênê
Bulbul be rûya dexwênê
Hewir mirwarî depirjênê
Şemall zîndeganî dênê
Nêrgis mest e û çaw be xumar

Wa ferşî çîmen raxira
Gullalle bû be şewçira
Gull desteyan best wek bira
Nesrîn û lawlaw têk xira
Hatine lence seru û çinar

Bulbul şew be awatewe
Badey şewnim dexwatewe
Degirî be munacatewe
Bellku gull dem bikatewe
Em pê bikenê ew bigrî be zar

Wenewşe wek min şînpoş e
Gerdinî keç kirduwe, xamoş e
Beharî lela naxoşe (11)
Matem degirê û be peroş e
Bo kurdî bêkesî hejar

Xuwa zewî zîndû kirdewe
Temî le ser la birdewe
Kurd be dirişt û wirdewe
Destî du'ay berz kirdewe
Xuwa ewanîş bika rizgar

Agirê le ser girdî yar e
Le textgay Xuwawe diyar e
Agirî newroz û behar e
Çiray rêy perwerdgar e
Le gell nûrî Tûr bû be yar

Awî ew karêze ciwane
Bêqewze û rûn û rewane
Awêney dillî kurdan e
Derman eka le tengane
Kewte kar nalley îxtiyar

## Newrozî martî 1948

Em rojî sallî taze ye, newroz e, hatewe
Cejinêkî konî kurd e bexoşî û behatewe

Çend sall gullî hîway ême pê pest bû ta ku par
Her xwênî lawekan bû gullî allî newbehar

Ew renge sûre bû ke le asoy billindî kurd
Mijdey beyanî bo gelî dûr û nizîk ebird

Newroz bû agirêkî wehay xiste cergewe
Lawan be ‘eşq eçûn berew pîrî mergewe

Wa roj hellat le bendenî berzî willatewe
Xwênî şehîd e rengî şefeq şewq edatewe

Ta êste rûy nedawe le tarîxî mîlleta
Qellxanî gulle singî kiçan bê le hellmeta

Pêy nawê bo şehîdî weten şîwen û girîn
Namirin ewane wa le dillî mîlleta ejîn

## Nimûney kurdîy petî
## Min û estêrekan

Estêre berzekan edirewşênewe be şew
Wek min bedaxewen, ne sirewtiyan heye, ne xew

Çend sall e aşnay şewî bêdarî yektir în
Wek serser în, şewê serê nakeyne ser serîn

Min xwar û jûr le destçûwekey bêwillet, ewan
Wek xêllî xwar û jûrkerî kurd, wêllî asman

Şew, şewnimî ewan e, çemen aw exwatewe
Roj hellmî awî çawî min e serî exatewe

Diwê şew berî beyan bû, degiryan be ser mina
Minyan kesas ebînî le naw dost û duşmina

Dillsozî wam nedîbû ke bom bigrî wek xeşîm
Firmêskekey ewan bû, be awingî tê geyîm

Bam raspard billê ke xefet boç exon ewan?
Wek ême nîn, nizîktirî lay baregay Xuwa n

Raspêrîyan nûsîbû be şewnim le ser giya
Ta asman pirîşkî bedîy êwe hellpija

Raspêrî hatewe ke billê: Xellkî ser zemîn
Nabê le destî kirdewetan bêxefet bijîn

Hawarî kurdekanî serû geyiye asman
Bew dûkellî henaseye, aw dê le dîdeman

## Pendî ballinde

Baxewanê bû le dêy kostey çem
Baxêkî ciwanî hênabuwe berhem

Herçî mîweyêk nawî bîstibû
Naştibûy, be rîz rêkî xistibû

Gullî hênabû le popey çinar
Lêy dabû çinar, gull bû be behar

Bîstûçiwar çeşnî tirê lê dabû
Rewneqêkî way bew baxe dabû

Eyangut: Eme baxî Îrem e
Billêy beheşt e hêştaku kem e

Dewrî baxekey hemû hencîr bû
Cînsî hencîrî şarî Ezmîr bû

Qelebaçkeyêk wa pêy fêr bûbû
Beyaniyan eyxward hênd lêy têr bûbû

Le diway têrxwardin hellîeweran
Mîwey tirîşî têk ra ejakan

Rojê baxewan telley bo dana
Pêwe bû qîrrey kird le tawana

Baxewan hêndey dax le dilla bû
Çeqoy derhêna, serî birrêt zû

Qelebaçkeke lêy hate ziban
Witî: Memkuje laloy baxewan

Bew şerte carê ke ta demênim
Îtir dîdarî baxit nebînim

Sê amojgarî wayşit bo dekem
Yekî gencêbê, bê ziyad û kem

Yekem: ew çiştey kewa mehall e
Şiwênî mekewe, rencit betall e

Duwem: xem mexo, ke mall le kîs çû
'Umrîşit errwa, xem ebê be dû

Sêyem: be diroy xellik tefre mexo
Be şiwên kirdewey herama meço

Baxewan emey wa çû be dilla
Çû berrelllay kird le dawî çilla

Qel firrî çuwe ser liqî darê
Ke kes netiwanê bîxate xwarê

Rûy kirde kabray baxewan, witî:
Daxekem bo to ke bêqîsmet î

Min gewherêkim le naw ziga bû
Bitfiroştaye be milyon eçû

Baxewan witî: Were aşna be
Lem baxey min da serberella be

Qel be pêkenîn witî: Min êsta
Pendim day, ke çî le lat newesta

Min witim: Be şiwên mehalla meço
Carêkî tir çon min dême lay to?

Witim: Xem mexo ke mall le kîs çû
Ebînim rengit hellbizirrka zû

Witim: Be diro bawerrt nebê
Le zigî qel da çon gewher ebê?

## Pendêkî baş

Piyawêkî kurd çûbuwe Besra
Sibeynan le wê şîrî egêrra

Yekaûyek awî tê ekird
Qazancî zorî lê dekird

Sermayey bû be sed lîre
Hesta bêtewe bo êre

Siwarî paporr bû bo Bexda
Şewê le ber mangeşew da

Xerîk bû pare bijmêrê
Xuwa xirap bo xirap enêrê

Meymûnî qeptan peyda bû
Ew kîsey lîrey tê da bû

Firrandî û be dara hellgerra
Kurde, aramî lê birra

Rîşî rinîyewe be giryan
Hawarî birde ber qeptan

Qeptan herçende lêyî tund ebû
Meymûn berew jûrtir deçû

Ta geyiye tewqeserî dar
Lîreyêkî bo xiste xwar

Yekêkî hawîşte naw aw
Ta sed lîrekey kird tewaw

Yekê bo aw, yekê bo kurd
A bem pêye beşî ekird

Kurde şêt bû le daxana
Hellsa çû be gij qeptana

Qeptan her waqî wirr ma
Lem heraye serî surr ma

Rûy kirde kurde witî: Bedbext
Em pareyet le kiwê dest kewt?

Witî: Şîrfiroşîm ekird
Be çend sallim girdewe kird

Witî: Têgeyiştim çî ye
Sûçî meymûnî tiya nîye

Nîwey hî aw bû, kewte aw
Toyiş beşî xot wergirt tewaw

Kasib xoşewîstî Xuwa ye
Heram bo kesib agir û ka ye

## Peyrrewî şa‘îrêkî betam

Çend xoş e baz û hellmet bo basik
Xerqî ‘areq bê kelle heta sik
Zirrey zincîrî gurîsî lasik
Xirîwey derman, biruskey asik
Cirîwey rêwî, darberrûy nasik

Nekey bêbeş bî, heste zû birro
Lezzet bibîne, mebe destxerro
Zistan be rûtî, behar rencerro
Şatû be hawîn, germey sêberro
Be fîday ballat bim, egirîce perro

Ferteney behar, surrsurrey behrî
Wirya be giyane, nekey qet bimrî!
Sînî be mencell, sêpa be dewrî
Çêşitî her şit e, xurîştî horî

Fitîl û bomba, dem zurrna û bilwêr
Le gell cema‘et her yek nerreşêr
Kerkûk û Lenden, ‘Erbet û Hewlêr
Çûyne ser lutkey şaxî Şarbajêr
Bo rawemasî bin berd û tawêr

## Peyrrewî şa'îrêkî bênaw

Balla wek kend û bêgerd û nasik
Kelle wek deholl, mil weku dasik
Tifeng le şan û be siwarî lasik
Çend xoş e baz û hellmet bo basik
Xerqî 'ereq bê kelle heta sik

Bigrî be qetar, şad be berrorro
Nenkit mirduwe, hellperre emrro
Gêlas û şifte hey tûrre û tirro
Nekey bêbeş bî, heste zû birro
Be fîday ballatbim egirîce perro

Sûtûy nêrgele û giftûgoy qumrî
Çeplle be laqî şestûnoy hîcrî
Semawerî zerd, xellûzî befrî
Ferteney behar, surrsurrey behrî
Wirya be giyane! Nekey qet bimirî

Gullalley hetaw, sêberî çetrî
Awêne û şane û kêlî ser qebrî
Kil û kiltûrî destarr û tewrî
Sînî be mencell, sêpa be dewrî
Çêştî herrişte û xoriştî çewrî

Semay mirîşk û qûqûy kelleşêr
Be destî şkaw, be dû çawî kiwêr
Bê, ba binoşîn dû cam awî swêr
Çûyne ser lutkey şaxî Şarbajêrr
Bo rawemasî bin berd û tawêr

## Pêhellixzan e

Pêhellixzan e qewsî xizan, helldesênewe
Sall bê behar nîye, be behar her dejênewe

Em xake berze fêr e be zuqm û be befr û ba
Badî beharî leşkirî zistan eda be ba

Çend tirsinok û bêwire bûn gewrekanî kurd
Mey'ûs ebin be bayêkî bêwade, destûbird

Pêyan billên: Tekerrur e tarîxî kaînat
Roma û Doçe çî bûn û êsta çîyan lê hat

Em Dîcleye ke êsta be bêxem deka guzer
Ew Dîcleye Hulako berî bestibû be ser

Sed kasekel le kasey kellekeyan kira
Çend Nadir û Reza le ser ew texte danira

Em kurde gurd e, nawî le naw naçê mayewe
Rojê debê be babanewe bêne kayewe

Hîssî heyatî mîllî ke kewte killêşewe
Sûretpezîr e rengî beqa bew qillêşewe

## Pêşrrewî ziyaretî Mewlewî

Ey be naw me'dûm, wey be giyan mewcûd
'Edem zînetî dawe be mewcûd

Ba me'dûmîş bî, namirî her ewî
Hemû şî'rêkit elê: Mewlewî

Şî'rekanî to hemûy îlham e
Şî'rî tir le rûy ew da bêtam e

Sozî kurdîy to le ateşgawe
Agirî newrozî xiste dunyawe

Ew hewtewaney le "kabe" da ye
Her şîr û şîrî wiştirî tiya ye

Şî'rî to le ser çiyay Kurdistan
Şaxey şetawan, harrey befrawan

Le qellemrrewî Kurdistanewe
Yek kewtin lawan be seyranewe

Dêne ziyaretî mawa û merzî to
Be nexmey şî'rî saf û berzî to

## Pîrozaney zanistî

Berz û billind e hênd derecey xakekey weten
Hêşta beharî ême nehat, sewz nebû çemen

Çiwar la behar e, bezm e neway saz û zîle ye
Lay ême şest e, serbekillaw e û rehêlle ye

Nîsan beharî ême ye, wa çawerrê yîn ke bê
Her qetreyekî gewher e, terzey legell nebê

Zistan gelê be zuqm û hella bû, emanewê
Padaşî befrî sardî, beharêkî derkewê

Her goşeyekî xakî weten bête gullşenê
Hewrî beharî bigrî, çemen şad bê, pê bikenê

Serî her çille gulê be newayekî bulbulê
Bezmêkî cem bê! Bade, weku kanî hellqulê

Her bêşeyekî pirr le hîjebir û pilling û şêr
Bo rojî îhtiyacî weten, canfîda û dilêr

Lefzêkî çend muheyîc e nawî weten ke dêm
Bîllêm siruştî ‘alem, lahutî dête giwêm

Mijdey beharî pê ye şkofey nîhalî gull
Wek ayetî jiyanewe umêd eda be dill

Emşew gullî umêdî wetenman depişkiwê
Mîllet umêdewar e be zanistî pêş kewê

Zanistî ye sewiyey mîllet billind eka
Zanistî ye ke ême binasê be Ewrupa

Zanistî zor be qîmet e, umêd atî ye
Em îhtîfal e "fal e" weten rû le hatî ye

Tewfîqî heq bibête refîqman lem îşe da
Wa dest le dest e, ellbete Xuwa qiwetîş eda

## Poker û coker

Poker ke, coker le hemû şiwênê
Xerc û bacî xoy be zor esênê

Wem zanî eme taze le naw e
Nemzanî sed sall le me û pêş baw e

Salim le me û pêş basî kirduwe
Ew be “gencefe” nawî birduwe

Sê as û dû şay danawe be fûl
Kiçîş bîbî ye, kurr lotî bêpûl

Ewsaye coker danehatibû
Wa diyar e piyawî ewsa yekrrû bû

Îsta ke coker le jûr hemuwan e
Diyar e dûrrûyî modey zeman e

Coker nawî xoy be xoyewe ye
Herçî bitewê bo to ewe ye

Eger wêrgulê bikewête naw
Alîk û çiwarpê yek exa tewaw

Xo eger coker çiwarî tir yek xa
Stirît filoş e, ew karêş exwa

Ay poker çendit rêst le ser bêjra
Ay Montîkarlo çendit tiya nêjra

Hî wayşman heye be wişkemele
Potyan dû fils e, ewîş her hel e

## Rastî

Piyawêkî xizmî ême Feqê Qadirî Gurgeder
'Umrî be raw û suhbet û xoşî debirde ser

Pênc barî ême basûq û sicûq bar eka le wê
Xo diyar e bacgir lew sererrêye pareyan ewê

Ew wexte îhtîsab bû gelê pareyan esend
Bacgir le dewrî şar hemû rêyan ekirde bend

Piyawêkî tir dîsan weku ew barî pê debê
Şewgerde, şarezay hemû mellbend û rê debê

Tegbîrî bo deka delê derbazî keyn be şew
Deyzanî Hemze, bacgirî pîr, çawî wa le xew

Emyan elê: Dizîne û resmî dûqat ebê
Bem ayin û oyin û şardinewe çonman necat ebê

Lam wa ye her le rastîyewe rêy xom bigirme ber
Risgar ebim be rastî, hemû îş eçête ser

Karwankuje le ser Kurrekajawewe hellat
Qaçaxçî barî kird û be bêçirpe her dehat

Ta geyiye pêç û wirde dewen tûşî hîç nebû
Wey zanî destî dawete goyje necatî bû

Çiwar cerde raperrîn pelûpo û çawyan cerrand
Hîçyan be xoy nehêşt û keredêzyan firrand


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ba ew le wê bimênê û Feqê Qadirîş le dê
Lêy nust heta beyanî le gell şarçî kewte rê

Hat geyiye rastî Aşî Xelîl bangî lê kira
Têfikrî Hemze bacgire hat nutqî bestira

S: Barit çî ye? Biweste kerit ragire le wê!
C: Basûq û sicûq û mêwij û doşaw e, çît ewê?

S: Rût reş bê, bo çî gallte be rîşî spîm ekey?
Min bêm hîç nebê birro derdî serîm edey

C: Xerefawî pîre! Gallte be roj nakirê were
Herçî ke pêm witî heye, barmiteket bere

S: Def'ul bela be, têperre alltûn bê bareket
Min namewê ser û semene û sekut û çareket

Lêm la de gurgî Gurgederî gerr ke raperrim
Sed gurgî wek to helldedirrim, îstekeyiş kurrim!

Herçend witî ke rast ekem, ew tûrre bû nehat
Rast û rewan le bacgir û cerde necatî hat

Seyrî ke rast û çewtî netîcey be çî ega?
Wa çak e piyaw hemû demê rast bê, diro neka

## Razî dill

Îşêkî wam bû be kes nedekira
Le naçarî da henasem birra

Carê le bend da hatin bimkujin
Sêdare çeqa, bom birra kifin

Ke çî tê fikrîm le pirr risgar bûm
Wayiş nebû billêy be rêkewt derçûm

Zor çak tê geyîm to kewtiye firyam
Çespandte dillim, ke bizane Xudam

Be rastî zanîm her toy destgîrî
Le tengane da her tom le bîrî

Le tonasîn da hawar kesas im
Hoşêkim berê toy pê binasim

Wabê, be yadit dillim raçenê
Regî gunahim le bin hellkenê

Be gerdin ke çî heta bitwanim
Xom le baregay to da bizanim

Dillim bête coş bê mey meynoş bim
Ta rojêkî tir mest û medhoş bim

Ta deçime jêr gill her roje satê
Yadî mîhrî to em keyfem batê

Destim pê girtûy, şermendem meke
Bo bexşîn lay to nîk û bed yek e

Eger gunahî min xoy neniwênê
Şêwey lêburdin le kiwê demênê

Diyar e min herçend xom hellşirgênim
Natwanim pûşê çakî biniwênim

Her kirdeweyek bom danrawe
Le pêş kirdinî lay to nûsrawe

Hatin û royînman her be dest to ye
Tê negeyiştûyn lem hatûço ye

Çonman lê xurrî ême wa derroyn
Key balladestî destellatî toy n

Çakî û xirapî le towe dira
Xot fermût: Rojî ezel beş kira

Ke lew texteyey lay to nûsra bê
Kê rêy dekewê bilê: Wa nabê

Rastî le rastî to hîç natiwanim
Pêş xom nabînim, nedî û nezan im

Ewende heye fermûte: Bende
Ke parrayewe le lam pesend e

Deparrêmewe newek bo dinya
Xoşewîstîy tom dewê be tenya

## Rû le xoşî

Çend xoş e însan xellkî şarê bê
Herçî bibînê xwêndewarê bê

Xwêndin û huner emende baw bê
Herçî bîdwênî fezllî tewaw bê

Katê ke mîllet qedrî bizanê
Mindall hewill eda heta etwanê

Ke mindallêkman geyiye caîze
Billê pêyî sebeb se'î ye caîz e

Yekê xellatî huner epoşê
Zor kes eyewê wek ew têkoşê

Qewmêk pêşewayî başî pêş kewê
Le diwayiş bê diwayî her pêş ekewê

'Îlim 'elem e bo supay şewket
Êmeş emcare hunerman derkewt

Oxey çend xoş e lem şiwêne berze
Komell bibestîn zor car bem terze

Dillman be feyzî me'arîf şad keyn
Emca mudîrî me'arîf yad keyn

Tehiyyat bo Xuway hemîd û mecîd
Supay bo fezill û xidmetî Mecîd


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

## Serguzeştey pêrêjinan bo mindallî giwê agirdan

Pûr Tillêxan bizinêkî bû
Sibeynan bo bêre deçû

Kîtelley ebird eydoşî
Le mallewe day'epoşî

Rojê mam rêwî doziyewe
Serî la bird be diziyewe

Millçemlliç şîrî hellqurrand
Pûr Tillêxan kilkî perrand

Rêwî raykird bo naw rêwiyan
Lêyan kirde çepllerrêzan

Hey rêwî kilkîbirrawe
Hêcgar abrrûy tikawe

Rêwî çuwe lay Tillêxan
Lêy parrayewe be giryan

Witî: Kilke qullêm wêde
Dapîr witî: Şîrim pê de

Rêwî witî: Şîrim nîye
Dapîr witî: Ey biz çî ye?

Rêwî royî serî kiz kird
Xwazbênî şîrî le biz kird

Witî: Biz şîr bo dapîr da
Dapîr kilke qullêm wêda

Bizin witî: Dar gella da
Giwanî biz le şîr qella da

Enca biz şîr da bo dapîr
Kilke qullêt bêtewe gîr

Rêwî hellsa çû bo lay dar
Girya û destî kird be hawar

Dar witî: Ba kanî aw da
Liqî min sewz bê û gella da

Rêwî rûy kirde lay kanî
Mişûrî ber ewîş hanî

Kanî witî: Kîj çopî ka
'Areqî rûyî le kanî ka

Kanî ewsa aw bo dar da
Dar sewz bê û gella be bar da

Biz bê gella bixwa û şîr da
Le tolley şîrî dapîr da

Dapîr şîrî dî le cê da
Ewsa kilke qullêy wêda

Hawarî bo lay kîj hanî
Kîjan bênê bo ser kanî

Kîjan kewşî sûryan nebû
Penay birde lay kewişdirû

Kewişdirû nardiye lay mamir
Hêlkey bo bika be qirreqirr

Mamir danî lê dawa kird
Enca dalldey bo cûtyar bird

Cûtyar danî da be mamir
Çîkilldanî mamir bû pirr

Be garegar hêlkey bo kird
Bo westay kewişfiroşî bird

Westa kewşî bo kîj dirû
Kirdiyane pêyan zû be zû

Çopî le ser kanî kira
Le kanî aw be dar dira

Dar gellay da û biz şîrî da
Rêwî şîrî dapîrî da

Dapîr kilkekey dayewe
Be binêştetall gîrsayewe

Rêwî çuwe naw rêwiyan
Lêyan kird be gallekêşan

Wityan: Bonî binêştetall dê
Deriyankird hatewe bo dê

Destê cilî ciwanî dizî
Kirdiye ber be de'ye û fîzî

Hate naw rêwiyan zû be zû
Wityan: Hey, emet le kiwê bû?

Witî: Le bin gomêka ye
Sed emendey tirî tiya ye

Werin biçîn nîşantan dem
Wek min derîbênin be dem

Birdinîye ser gomî Seraw
Yekêkiyan xoy xiste bin aw

Be bllqebilliq ew dexinka
Em deygut: Wa bangtan eka

Hemû xoyan tê firrê da
Be carê xinkan le wê da

Rêwîş dinyayî nebirde ser
Kirdey bedî xoyî hate ber

Rawikerêkî lê peyda bû
Kuştî û bazarrî kota bû

Herçî wek rêwî fêllbaz bê
Tûş debê, nabê derbaz bê

Xuwa rast e û rastî la xoş e
Çewtî serencamî boş e


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Sermestî rojû

Xuwaye em dillem hêzêkî berê
Ke xem le naw xoyî bikate derê

Min xom nazanim çî bo min çak e
To be meylî xot dillim awa ke

Payey no nasîn eger derkewê
Îtir kê dinya û dînarî dewê

Min ke dêwaney to bim be tenya
Şeqê helledem le herdû dinya

Dillim hemîşe yadî to eka
Giyan le rêy to da cistûco deka

Lem xoşiyane da eger bê û bimirim
Bonî toyî lê dê giyay ser qebirim

Beheşt medih eken be naw û dawê
Min lîqay tom bê beheştim nawê

'Aşiq ke be rast destî le giyan şişt
Pekî seyran û gerranî xoy xist

Diyar e ke yarê ew wefayey dî
Kamî wîsalî bo dênête dî

Xuwaye eyzanî ke min tom ewê
Me'şuq çi rayey be to dekewê?

Xuwaye namewê ta'etim zor bê
Neweka nefisim bewe mexirûr bê

Xom be gunahkar edeme qellem
To xot fermûte hez le 'efu ekem

## Serserî

Bê hoş û şi‘ûr û dillfigar im
Naçar ke xerîkî ahî zar im

Sa bîkerewe girê le zullfit
Ew bende girê eda le karim

Wek befr e hemîşe ahî serdim
Nawêrî ke bête lam beharim

Çî bikem ke be şêtî kewtime naw şar
Hênd berdim ehawinê, sengesarim

Axir gullekem ke tom le dest çûyî
Dill pirrî ye le xar û pirrcexarim

Lem bêkesîye û le cewrî bêhed
Padaşim ewê le kirdgarim

Dînîşit le gell dilla firrandim
Lay Xuwayişim nemawe, şermesar im

Wa mamewe bê pena û hîway to
Tenha be xeyall e demguzarim

## Seyran û şayî

Pîroz bê lêman, pena be Yezdan
Zanistî, seyran, jiyan, jinhênan

Deholl û zurrnay seyran lê dira
Bo Ehmed Şukrî î'lanê kira

Xuwa zû rêkî xist, jinêkî hêna
Bû be Ehmed Xan tewaw da sukna

Î'lanî jiyan bext ekatewe
Şayî exate naw willatewe

## Seyrî jiyanî kurd

Bîstûme ke wa afretê ke le pêpîlkeyekî ban
Gayekî girte baweş û serkewt be bê wiçan

Diyar e ke jin ewende be hêz nabê, eme çon ebê?
Hêndey ke gayek hellgirê, key hellmetî ebê?

Ew gaye giwêlkêk bû le pêş da ke hellîegirt
Xoy roj be roj be birdin û hênanî fêr ekird

Ta giwêlik zil buwaye jine zorî zor ebû
Rahatin e be kurdî be bonay sport ebû

Pêşînanî ême beharan eçûne deşt
Gewre û biçûk be carê le wê komellî ebest

Layê be kewşek û şerretop, layê wirdekan
Aşetennûre, boxçe be gerdanê, piştlêdan

Hêcgar killawfirrênî kurrî gurcî pê dewê
Nabê bigîrê ba şeş û hewtîşî şiwên kewê

Herçî ke wa le ser qele mirdarê nan exwa
Nabê ke bêlê topeke berz bêtewe hewa

Eygirinewe xirap e, ewan dêne kayewe
Çiwarnan e ew kesey ke be westayî mayewe

Tenha be “babî babî” û kersiwarî siwar ebû
Êstake kersiwarî ye siwar roy bawî çû

Ew baz û hellbezîn û rakirdinî xwar û jûr
Nawcergî pak ekirdewe wek awêney bilûr

Her kewşî sûr bû, qondere çon kurd le pêy eka!
Ew singe rût û saxe le kiwê mawe êsteke

Ew piyawî bem hîwaye ke bem renge helldekewt
Nawî le naw qellemrrewî turkana ser dekewt

Êsteyiş ewane ye le 'Êraqa denasrê
Îtir be paşerok sewî pirrmîwe nakirê

Îdmanî êste hatote ser bezm û xwardinewe
Herçî ke zorî xwardewe başpallewan ew e

Pêkêkî ziyadî kird be sera ewsa cê be cê
Hoş û demar û pareyî be carê le kîs eçê

Ew cêgeyarîye xoşe ke çîmen bû ser be ser
Êste le şûşe şose ye ger piya ekey guzer

Dayikî weten delê: Ke esîrî zemane bim
Be kirdewey bed, be umêdî çî emane bim?

## Sirûd bo newciwanan

Ey newciwananî weten
Sa pêş kewin aza birron
Êwe berew zanîn birron
Dey tê koşin diwa mekewin
Le sêberî serbestî da
Ey dujminekanî nezan!
Gel eçête korrî meydan
Rizgar ebêt willatman
Zû namênê diwakewtinman
Be hêzî lawî newciwan
Lawanî tazey kurd werin
Behre le jînman wergirin
Bîrêk le dewran wergirin
Bo serkewtin hellmet berin
Bo xwênriştin ta bitwanin

## Stayşêkî pêxemer

Pêxemerekey xoşewîstî Xuwa
Xatem to yî, nebît nehatuwe le diwa

Zor pêxember hat ber û diwa têk ra
Xatemî xatem be kes nebirra

Ber lewey ke wa Adem sefî bû
To mustefa bûyî, bellam xefî bû

Mayey xîlqetî eflak luwlak e
Be elem neşreh sîney to pak e

Wezzuha siwêndî pirr nûrî rût e
Welleyl bo torrey sewadî mût e

Nêrgis ma zaxel beser ciwanî kird
Surmey Tûr, çawî, to herzanî kird

Mang be pencey to dûkert û şeq bû
Perwêz be namey to cêyî pê leq bû

Bûmelerzey to kewte dinyawe
Lew sawe golî sawe hellsawe

Subhane ellezî esra serat e
Qabe qewseynîş, edna, cêgat e

Sûrey wen necmit edirewşêtewe
Gullî ayînit egeşêtewe

Înna fetehna bo to beydax e
Ayey muzemîl ke way şîrdax e

Xuwa sellawatî le dîdarit da
Ew nûre diyar e le dîdarit da

To nebûytaye, be agirî Nemrûd
Nesllî Îbrahîm nedebû mewcûd

Ew Îbrahîme, to newey ewî
Le Kurdistana derkewt birewî

Bapîre gewret fexrî kurdan e
Mellbendî ew e em cê û mekane

Tuxwa her le ber dillî Îbrahîm
Derdman dermanke, tenya to yî hekîm

To em rojî toy tiya hatiye dinya
Çareêyik!! Hîwa be to ye tenya

Herwek rehmetul 'alemînî
Diyar e tenganey êmeyiş debînî

Bo xot eyzanî ke kurd dîndar in
Be ayînî to selabetdar in

Nakokîy nawxo hêlkî birrîwîn
Qellbey qellbezen, ke way dirrîwîn

Xoman be ehlî îman enasîn
Keçî keçrewîn, hêcgar kesas în

To ke xatirit lay Xuwa egîrê
Wa bike nîfaqman le naw hellgîrê

Ewsa ebînî çi ummetêk în
Le rêy xizmetî ayîn da tek în

## Şeşî eylûl

Xizmîne! Wa şeşî reşî eylûl gerrayewe
Agir le mallî kurdî killoll berdirayewe

Şaran be topî cejnewe seyran û keyf eken
Bo ême topî kuştine wa agirî eden

Bo cejn û şayî ye cilî sûryan ewê minall
Em cejne xwênî kurd e, felek kirdiye bergî all

Qey naka, ew le pêşewe xwênî ‘Elî rijand
Emsall be xwênî naheqî kurd rojuwekey şikand

Xwênxor ke har bû çil şew ejî gorrbegorr ebê
Bayî be bay diwayî ye, beydaxî şorr ebê

Dîsan perrî helloyeke peykanî lê eda
Kurdîş pellî le xoyetî wa êşî pê ega

Ey Xuwaye em perr û pelle ta key emankujê
Espê egiriye baxellewe, xwênit hellmijê

Îşteddî ezmeten xeberî tenfericî ye
Elbadî’u ezlemîş e ke tolley be gurcî ye

Em xwêneye beratî necatman edate des
Em qewme serbillinde serî nanewê be kes

Em care wa beratî necat xoy gerrayewe
Xuwa yarebê nabirrêtewe, negbet birrayewe

Bo jînî qewm e xwên le leştî şêrî şerzewe
Wek terze dête xwarewe lew cêge berzewe

Ew xwêne ye dillopêkî awî heyat eda
Namirê ewey le rêy wetena giyan fîda eka

Ax xozge em beşeyiş be min ebirra le firseta
Herwek ewan ejiyam le dillî pakî mîlleta

Çend berzî ye le bendenî berz û nizarewe
Hellmetberî be lawikî kurdî û qetarewe

## Şêx Ewilqadirî Goptepeyiş royî

Emrro dezîbê billên matem e
Qubbey nîlgon pirr tem û xem e

Şêx Ewilqadir ke yeke piyaw bû
Be hemû rengê piyawî tewaw bû

Bo rojî neberd gullenebirr bû
Geybûwe hefta, hêştaku kurr bû

Be penceyêkî ecel têk şka
Bêdest wek mindall le naw bêşka

Cexarî mergî rolley newandî
Qirçey agirî cergî sûtandinî

Hîç karê naka xem û rûgirjî
Lem dinyaye da, kê ta ser dejî?

## Şînîy Ebdulqadir

Ah Ebdulqadir! Çît lê hat, kiwê çûy?
Bellê to piyawî em dewre nebûy

Dinya xirap bû, ta hat egorra
Asayiş nebû, meger le gorra

Bellam be zewît be bawkta nehat
Piştit wa şkand wext e bête lat

To çak bûy keçî xirapît niwand
Xaneqay dillî çakanit rûxand

Bergî em cejne şîn e, matem e
Hewir ta bigrî hêştaku kem e

Taze nemaman walegulla ye
Taze nemamman wa le gilla ye

Felek hîç nallêm, pîşet bedî ye
Xuwaye hîç nallêm, xot kurrit nîye

Tarîxî koçe nîwe şî'rî diway
Qadir ebdî xoy bang kirdewe lay

Em bangkirdine nîweyî efwe boy
Qadir ebdî bang kirdewe lay xoy

## Şînîy Ebdulwahîd Nûrî

Em wêneyey be şînewe Jîn xistiye ser serî
Şexsêkî xoşewîst e be fezil û hunerwerî

Rencêkî zorî dawe, gelê lawî pê geyand
Asarî îqtdarî be te'lîfî xoy niwand

Geyiye ewey ke kellkî weten bigrê, destî merg
Pêçayewe be qînewe, xwênawî xiste cerg

Daxî giran e, qedrî nezanra le jînîya
Her Jîn e wa be nallewe egrî le şînîya

Tuxwa kurrîne! Lawîne! Bo lawî nîştiman
Wek Pîremêrd çiley bikene matem û fixan

Qedrî guzeşte, rexbetî ayinde be tîn
Namirin emane, wa le dillî mîlleta ejîn

## Şînîy matemî Emîn Zekî Beg

Çiray rûnakî kurd kujayewe
Textî Suleyman text kirayewe

Tomarî kurdî te'rîx hellpiçrra
Perdey reş be rûy edeba kêşra

Emîn Zekî Beg rojî remezan
Hewargeyî birde ser girdî Seywan

Lew sawe ke ew esperdey gill e
Firmêskim têkell be xwênî dill e

Derkewt zatêk bû be ‘ehd û peyman
Le diway roja hatewe nawman

Bo mîlletekeyî hênd têkoşabû
Qellemî dest û penceyî şkabû

Dîsan bo Pênciwîn têkoşayewe
Xêr aw û gill bû, wa hênayewe

Ta çerxî cîhan le gerr ekewê
Piyawêkî waman tiya hellnakewê

Dayikî xak wehay girtote baweş
Azarî destî kirduwe feramoş

Bellam min bendî cergim birraw e
Zû negeme lay karim tewaw e

## Şînîy Mistefa Efendî

Ax çi bikeyn legell çerxî çepger da?
Mînay dillmanî kêşa be berda

Birînî cergî kulandînewe
Çiray zanistî kujandînewe

Le girdî Seywan "mehşer" hellsawe
Em şare têkrra wa xiroşawe

Mistefa Fendî koçî diwayî kird
Xoşîy êmeşî le tek xoya bird

Hewrî asman kirdî be baran
Firmêsk ebarê le dîdey yaran

Hawîn û baran me'nay lê bigrî
Bo mergî azîz asman egrî

Em xellke kewa boy be peroş e
Sebaret be xûy çak û rûy xoş e

Xizmetêkî way kird le dinya da
Dersî exlaqî be mirdin da da

Coş û xiroşî şîwen birrwane
Tê degey qewmî kurd qedirzan e

Wek êşî daxî xoş nabêtewe
Şiwênîşî herwa pirr nabêtewe

Mistefa Mizhir ke naw nirawe
Bew nawe sallî mergî bêjrawe

## Şînîy muherrem

Xuwaye! Çi şorrişêk e ke bo xellkî ‘aleme
Dîsan çi newh û tem û giryan û matem e

Dîsan çi şîwenêk e çi heşrêk e rûy zemîn
Bê nefxî sûr heray le seray ‘erşî e‘zem e

Giwa ye ke xor le xawerî xwarû hellat ke wa
Aşûbî şîwenêk e qiyamet billêy kem e

Nawî binêm “qiyametî dinya”, ellên: Bellê
Em mangî matemîn e ke nawî “muherrem” e

Dîwanî Xuwa ke cêy xefet û xem nîye, le wêyiş
Polî firîşte ser le ser ejnoy ’eza û xem e

Cînn û melek be şîwenî ême le girye dan
Bo serwerê ke eşrefî ewladî Adem e

Rûnakî asman û zemîn, rojî meşrîqeyn
Baweşnişîn û rîşey cergî nebî, Huseyn

Katê kira be sermewe ew sere be zar
Rojîş serî be rûtî hellat kewte kohsar

Lafawî xem be coşewe rûy kirde şax û kêw
Hewrêkî reş be matemewe hat û girye bar

Rûy serzemîn be zelzelewe kewte gerd û xul
Westa le dewre û hereket çerxî bêqerar

Dawênî ’erşî ke lerzî hemû ehlî barega
Wityan: Qiyamet e, çî ye? Be bêwade kewte kar

Destey Herem ke hawdemî hûr û firîşte bûn
Pêçabûyanne ser milî wiştir esîr û zar

Herwa le Kûfewe be esîrî eçûne Şam
Ew Şame bû şeametî îslamî xiste kar

Lew rêgeye da Husên leşî bêser kewtibû
Hawarî xiste qafillewe, bû be şîn û zar

Bangêkî kirde dayikî: Kiçê! Fatîmey betûl
Birrwane Husênî kurrit, duxterî resûll

Lem xaku xwêneda leşî bêser, Husênî to
Wa kewtuwe, bizane Xuda çonî kird qibûll

## Şî'rî serbest

Birûskeyêk ke le pirr dêt le çawtewe tîşkî
Edate çawim û bînayî dîdem e, dîdem
Giyane! Nexmey neşîdekey nazit
Bendî laylayêk e bo ruhim
Le gell çiştê be dillta radebûrê
Demûdest wa le dillma bûyne yek dill
Ke dill teng bê, dillekutkem degatê
Le beynî dû dilla, raste ke rê ye
Telî çirayêk le'eşqî towe
Bo bendî dillim rakêşraw e
Ew demey ke to şewqit kiz ebê
Çiray dillî min kujawetewe
Le tarîkî da rencerro û bêkes
Le giwêagirdan serim kiz ekem
To bo min tenha, to bo min hemû
Çiştêkî to bo min
Xoşewîstî û xoşwîstin im
Zor pê xoş e bellam çî bikem?
Ax hîç kesî tir nanasim, ke wa bû
Tenha bo min to yî
Her to yî bo min, her to bo min ewî
Xoşim biwêy her to yî
Binwarre mang be nûriyewe şew
Rûn ekatewe
Binwarre şew beyanî nizîk xoy exatewe
Seyr ke beyanî baweşî bo roj ekatewe
Binwarre roj ke nûrî dexate wilatewe
Hengiwîn û şîr û jîn û xeram têk exatewe
Ba toyiş lîqayekit le min awirr bidatewe
To şew be, gunahim bixere jêr perdey zullfit

To şewqî beyanî be, cillewkêşî hetaw be
To roji be, were pallmewe ke bibimewe tullfit
Bo me'kesî 'eşqî ebedîm horîy tewaw be

## Şîwenî şehîdanî kurd

Em asmane şîn e, kewa bergî matem e
Tehlîlî wa kirawe ke qubbey xem e, tem e

Çerxêkî kon e, makînekey jengî girtuwe
Çewrî nekey be xwên, pekî sûrranî kewtuwe

Pîrêjinêk e her şewî şûyê deka be xellq
Sûraw be xwênî mêrdî deka, pêy delê: şefeq

Gullgûn be xwênî aşiq e dêwcamekey felek
Çingî pillingî nawete jêr qaqûmî bellek

Gahê be xwênî "alî nebî" sûr ebê Furat
Xwênawî kurdî têkell e Dîcle ke ziyad ekat

Em ʻesrî bîstemî medenîyet le axira
Herlayekî qenare bû bo ême hellxira

Ewyan Yezîdî zallim, em xayinî le'în
Ta key be dest emanewe ya reb esîr ebîn?

Daway heyat ekeyn, be mematî tê degen beşer
Ferqî nîye çi jîn û çi mirdin, çi xêr û çi şerr

Herçî reîsî kurd bû be sêdareda kira
Baqî be mallî Xuwaşewe sûta le agira

Ta êsta hellnekewtuwe, wek gewrekanî kurd
Rohyan spard le rêy wetena, nalleyan nekird

Kê dî be xeyrî mîlletekem lem tebare da
Înşadî şî'rî mîllî le payî qenare da

Serdarî ême bû, ke le ser dar be pêkenîn
Bangî dekird: Be kuştinî min mîlletim dejîn

Şad în û fexrî pêwe dekeyn, bem hemîyete
Mirdin ke bo jiyanî weten bê, mezîyet e

Ax xozge helldekewtewe êmeyiş le firseta
Wêney ewan bijîn le dillî pakî mîlleta

Şert bê hetaku layê le layê nebêtewe
Xwênsendinî ewane le bîrman neçêtewe

Em xwênî kurde herweku xwênî siyaweş e
Xwênî nesênî helldequlê, daîma geş e

Nawî emane lazim e bîkeyne ber hemû
Tehîyicî hîssî mîllî ye bo întîqamî zû

Serdefterî şehîdî weten nawî Xalîd e
Wek nawî Xalîd e, le dilla xoyşî xalîd e

Şêx Qadirî reîsî hemû xanedanî kurd
Mîratî ceddî "kerb û bela" bû, be îrsî bird

Daykî zeman e carêkî tir nayenête dî
Lem kurde da xezenferî wek Sey Mihemmedî

Xo Şêx Seîdî gewre le maddî û me'newî
Nebuwe be 'ezm û rezmewe pîrêkî wa qewî

Yusif Ziya ziyayê bû. Ax! zû kujayewe
Gewrey Kemalî, rêwîyekî gerr bû be layewe

Duktor Fuad ke rojî ezel eşqî kurdî bû
Ta mird le hesretî wetena, ahî ser dîbû

Dû aşiq in, Fuad û Kemal, herdû bêmîsal
Em eşqeyan geyandbuwe mertebey kemal

Qoçzade qoç bû, wa buwe qurbanî mîlletî
Sed aferîn le roh û le qoçî hemîyetî

Zaten şehîd şerîf e, Şerîfîş şehîd kira
Kurdî qirran bû, qirr le wezî' û şerîf xira

Lem qaflley mubareke da şaî'rîş hebû
Bo weznî şî'riyan egîne xetay nebû

Bo ême lazim e hemû salê heta dejîn
Em rojî bîstûçiwarî eyare bikeyn be şîn

## Şorre bî

Erê şorre bî ser hewzekeman
To sêberê bûyî hawînan bo man

Behar belenceûlarî xeraman
Şinet ebûwe baweşên bo giyan

Be bergî sewzî tawisî kallat
Hewzeke bibûwe awêney ballat

Êsta boç rût û bêberg û bar î?
Serşorr û rengzerd, kiz û xembar î

Witî: Wêney tom, bê ziyad û kem
Le mallî to dam, wa le to dekem

Ciwanî xewêk e, ta çaw hellbirrî
Katêkit zanî royî têperrî

Ciwanî beharim, min ke şorre bî m
Ewîş xewê bû, dîm û ya nedîm

Hîç nebê behar min sewz ebimewe
Êwe pîrîtan ta mehşer şew e

## Tafî ciwanî

Ciwanî cela ye bo zîndeganî
Hay le cirîwey tafî cewanî

Katê şorrekiç eçête kanî
Gozey mêşero wa le ser şanî

Dill helldetekê be helltekanî
Le xirîngey bazin le gell şillpî aw

Ke eypirjênê û eşwa demûçaw
Tinokî aw gizingî hetaw

Bo pêşanîy zîw ebê be zaxaw
Deway luqman e bo cergî sûtaw

Sed le'l û ellmas bê be qurbanî
Şewî mangeşew çirpey naw kollan

Le pena dîwar lêw le ser lêwan
Bew sewdayewe le yektir birran

Bew xeyallewe, xewî şew zirran
Be ah û nalle ta demî beyan

Hîcranî yar û dengî hîcranî
Le ser karêzî şerîf beharan

Seyranî newroz tîpî nazdaran
Hellperrkêy bilwêr le naw gullzaran

‘Îşwe û awirrî çawbexumaran
Pîr exatewe kellkelley caran

Eyhênine coş bo nîştimanî


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Taqtaqkere

Taqtaqkerekey serdarî kanî
Boç denallênî heta beyanî?

Hîç kes natwanê ta roj binallê
Meger ’aşiqê sewday xallê

Ewa min diyar e bo yar enallim
To peycorî kê yî? Hawar be mallim

Min gencî şadîm cerdeyek birdî
To çît lê qewma? Kê way lê kirdî?

Min ruxsarêkî wîney Şemim dî
Derdî perwanem lê hatuwe te dî

Nalley min le şewq ew ruxsare ye
Ahim le dûrîy ew dîdare ye

To kê derûnî wa hellqirçandûy?
Kam kafir wa bem derdey geyandûy?

Min sûtawî ew şu’le û ew nûre m
Dêwaney cezbey ew kêwî Tûre m

Mûsa ”erînî!” wit, kewte tika
Be “lem teranî” abrrûy tika

Minîş temennay dîdarim ekird
Le ciyatî dîdar em ‘eşqem wergirt

Diyar e min û to herdû hamferd în
Herdûkman wek yek tûşî yek derd în

Were herdûkman nalleman yek xeyn
Bellkû bem ‘eşqe nîştiman ser xeyn

## Tavgey Zellim (1)

Awe ciwanekey serçawey Zellim!
Boç behar lêll î û payîz ser be tem?

Ellêyî serçawey bextî kurdan î
Cê be xot nagirî, wêllî herdan î

Serçawet serberz, sard î wek terze
Danet mirwarî, lencet sed terz e

Lew asmanewe errijêyte xwarê
Le çawî gerdûn firmêsk ebarê

Wêll û sererro be ro ro û pirr derd
Be qellbezewe ser edey le berd

Dest le milanî legell Tacero
Be sewday Sîrwan wêll û rencerro

Le diwawan da keyek egirî
Wek dû mîsra'î beytî Mewlewî

Sîrwanî em çem Tanceroy ew çem
Biden wehem da em çem ta ew çem

Meweste birro be lim û xaka
Bigrî le rewzey Selmanî Paka

Pêy billê: Qurban, to nawit pak e
Bimanxere rêy yekêtî û çake

Diway ewey billê: Ew xake dêm e
Çon paraw ebê be awî ême

Ke wa bê tu Xuwa tabrûman meben
Wek kay bêgane memanken be şen

Gunahman çî ye ke destî Yezdan
Be cê û rê êmey xiste jûr ewan

## Tavgekey zellim (2)

Tavgey zallim zellim, tavgey zallim zellim
Firmêskî çawî çerxî pirr sitem

Zadey cergî kêw mewcudî ’edem
Dêwane asa şeyday rû le çem

Ser le berd edey dêwanekey Şem
Sirewtit nîye le nallîn yek dem

Lew kêwe berze errjêyte xwarê
Rêzey mirwarît le dem ebarê

Diyar e ’aşiqî wa nall e karî
Sehra newerdî peycorî yarî

Perwane be soz xoy esûtênê
Awî sardî to cîhan ejiyênê

Em ser le berd e û em hellpirrjanet
Ya hû ya men hûy qudsî teranet

Bo zîndeganî Şarezûrman e
Ax mîlletekey qedirnezan e

Bax û dirextit le berda naken
Ta bew sayewe willat awa ken

Eger gişt kêllgey daçênrê delên
Fîr’ewnî xakî Mîsirî pê dellên

Eger Şarezûr bêt û awa bê
Roj geştî Mîsir ebê awa bê

Xornewazanî şay Xan Ehmedxan
Bûbuwe nimûney îremî cîhan

Êsta ew şiwêne ke wa wêran e
Bo çawî hîwam buwe be tane

## Tazegullî çîmen în

*Le ser awazî taybetî degutrê*

Tazegullî çîmen în
Berxekorpey weten în
Ême ke destey kiç în
Hemû bo mekteb eçîn

Pêxember xoy fermûye
Beheşt jêr pîy daykan e
Bellam dayik ewane n
'Îlm û fenyan rewan e

Heta sewiyey kiçanman
Berz nebê le îdiraka
Minallî çak pê naga
Weten tereqî naka

Ême hez le şerr nakeyn
Be hîway xwêndin û çake yn
Netewey baş peyda keyn
Wêraneman awa keyn

## Tefre û çaw û rawî pif helldiraw

Bitzanyaye gorr e serencamî jînî to
Errizê le jêr gilla qed û balla û surînî to
Namênê xall û mîl û dem û pêkenînî to
Dillit nedeşkandim

Bitzanyaye cameyekî caw le ber ekey
Tellqînî kiwêrekan e le cêy dengî nay û ney
Lew cêge teng û tare be tenhayî helldekey
Le xot nedeterandim

Bitzanyaye dest le milanî beyanîyan
Çend xoş e, ta le gorr exizêy, mestîy têkxizan
Çarey be nezm û bezm e, xemî gerduşî cîhan
Wa ratnedeperrandim

Bitzanyaye ciwanî guzergahî pîrî ye
Mergîş kutupirrêk e, diwa napedêrî ye
Emrro ewey be ciwan ebirrê destgîrî ye
Ciwanît pê deniwandim

## Temaşay cîhan

Xuwa katê wîstî xuwayî biniwênê
Emrroy bo danayn le şiwênî diwênê

Wîstî rûy zemîn bê be karzar
Newey Ademî hênaye rûy kar

Dinya be yek da hatuwe û ejenê
Xoyşî le ser da pêy pê dekenê

Lew meyane da danay hellbijard
Rêpîşandanî xoy be wan spard

Înca ewaney ke Xuwa enasin
Destî ewane egirin ke kas in

Eyanben bo ser rêy ‘îlm û zanîn
Bo tiwêşûy rêgay ewla pêk hanîn

Dû rêy e, herdû ser yek eçinewe
Kiwêrayî nebê, lêk ciwê nabinewe

Yekê terîqet, yekê şerî‘et
Aşkira û penhan herdû heqîqet

Heqîqet derya û şerî‘et gemê
Terîqet xerq e ger la da kemê

Terîqet le ser sê quwet bend e
Bew sêye xuway xoy enasê bende

Yekemyan fena, duwemyan wefa
Sêyem lîqa ye semerey cefa

Fena xo le xo rizgarkirdin e
Be kuştinî nefs gire û birdin e

Wefa peyman û şertbecêhênan
Înca egeye lay lîqay Yezdan

Ke le xot birray dost lat hazir e
Cawşura û kutra, înca gazir e

## Tesewîf

Eger gunahkar bîbê ew hoşe
Bizanê efum çend le la xoş e

Gunah û tobe eka be 'emdî
Ta arezûy min bihênête dî

Hêndêkîş ellên Xuwa le heqî xoy
Xoş ebê û naybê heqî min û toy

Mîsqale zerretîn şerren yereh-e ye
Zor wird nûsrawe em laperreye

Rastekey wa ye, ke em de'waye
Siza û lêbûrdin hemûy be Xuwa ye

Pêxemberî wa heye qatill e
Le ulul 'ezm-a keçî daxill e

Tuxwa bînere dillî wêrane
Merriwane hîkmet her wa kiwêrane

## Te’zêdar

Te’zêdar mandû n, bellam şerm eken
Sê rojigane xor, şîwen germ eken

Mirdûşor kuştey heqî xoyetî
Kiwêrîş bo xwêndin pelûpoyetî

Her xawenmirdû mallî wêran e
Ta mangê kasî nûkey jinan e

Qewmê netwanê te’zê hellgirê
Wetenperwerî çon pê ekirê

Wa wesyetm kird, xizman giwê bigrê
Le’net lew kesey te’zêm bo bigrê

Mudde’î wazî le heq hênawe
Şahîd dûy kewtuwe, hellîpêçawe

Xûyê ke girtit serdemî şîrî
Pêt terk nakirê be weqtî pîrî

Axa tancîyekî bo hat be xellat
Le têberdana ser awî ehat

Ewî qerz le lay xoy dêllêtewe
Sed bertîl qerzê nabijêrêtewe

Be mîwandarî nebî ye kiwêxay dê
Be zubanî şîrîn mar le kun derdê

Goranî billê ke kemtiyar çak e
Qulepêy bisimî hêşta deng naka

Şuhret afet e lêt nabêtewe
Cam bişkê bellam neziringêtewe

Le gewregewrey Baban û Pişder
Hanaman kewte qunfirrey Hacer

Îşit be dest bê hîwat lê deken
Pilar be darî berdara deken

Emek serif meke bo xerrat û dom
Le kîsit deçê wek tirrî bin gom

Xot heq nesênî lezzetî nîye
G....... be g..... xellk pazewanî ye

Piyawî mi'ecîn dûy xellk ekewê
Mar sîrî nawê, le derkî errwê

Tecirubedîde be ra û tedbîr e
Herçende pîr e, kone begîr e

Xowillatîman la pesend nabê
Giwêlkî xomallî be gacût nabê

Pûr be tedbîr û eqllî temam e
Gunî bibiwaye, eyangut mam e

Hîç kesê nallê dom tirş e û germ e
Jîşik be bêçûy xoy ellê nerm e

Eger 'edalet awirr batewe
Gurg le gell merra aw exwatewe

Axa hatewe dîsan tirrziltir
Ker çuwe Bexda buwe be êstir

Şar bo min derd e û bo xellk dewa
Tenha banêk e, keçî dû hewa

Bin kilkî bizin hîç daneposra
Carê merr derkewt, kirdiyane hera

Eger sermela bêt û bitirrê
Hemû cema'et niwêjyan ebirrê

Diwê şew le xew da paşay şarê bû
Ke le xew hellsa, dill xembarê bû

Êstayiş her modey çoxe û killaş e
Pîşey pêşûman dewen be aş e

Dewllet ke nema, nawî nabirê
Tazekay kone, be ba nakirê

Bênewayiye şerrî giwê kiwanû
Tirrken nanê co deka be biyanû

Xanût derruxê gillekey la be
Negbetî çak e, qortî xirap e

Bira ger biray xoy le diwa bê
Nanewê meger qezay Xuda bê

Diwênî zem, emrro medhit dekirê
Hêşta be wane bawerr ekirê

……. eme le toy rû dawe
Sey kunemasî û pasî cirtawa

## Tiwancî mîlliyet

Be çawî ciwan û xet û xallewe
Be tiketikey xwênî allewe
Le ciyatî kifin be bermallewe
Firrêyan daye qurrgî çallewe
Bê tellqîn xoyan hatine mallewe

Kê bû ew lawe ke wa mirdibû
Be weten nawî xoy derkirdibû
Le gellman gelê raybiwardibû
Em diwayiye baryan hênd qurs kirdibû
Neytiwanî bijî ew bew hallewe

Kelîmey sûkî hênd pê bêjra
Be tûrekey turk xakî bêjra
Xwênî şîrînî rolley rêjra
Piyawî be karî hemû nêjra
Qînî hellnesa emende salle

Witî: Behîçe boç xefet bixom?
Xo her çonê bê, min ejîm bo xom
Çîm le wey xellqî ehawêjne gom
Taze darî wişk najêtewe bom!
Beşe zewîy min be kiştûkall e

Ne tolley rolle, ne etkî çepok
Ne keçkulahî û dadirrawî berok
Ne benwêllî şeq, ne bombay firrok
Nayênête kar piyawî tirsinok
Meger be zuban kewête nalle

Ne be Xuwa, qewmê giyanî nexoş bê
Serî tezî bê û sirr û bêhoş bê
Le rastî zordar hellqe be goş bê
Nawî nemênê! Ba feramoş bê!
Mirdin xoştir e bo ew lew halle

## Tozê le tozî bay Silêmanî

Be çawma bê, eger tozê le tozî bay Silêmanî
Ke nûrî Tor e, tûrê nayenê, surmey suleymanî

Şemall dênête giwêm dengî minallanî qutabxane
Neşîdî mîlliyan wek zemzemey lahutî Rehman e

Hîwam pêyan e em destey kurrane meş'elê hellken
Le tarîkî nezanîna be zanistî weten derken

## Watey bêsûd

Pêşînanî ême beharan eçûne deşt
Gewre û biçûk, be carê le wê komellî ebest

Layê be kewşek û şerretop, layê wirdekan
Aşetenûre, buxçe gerdanê, piştlêdan

Hêcgar killawfirrênî kurrî gurcî pê dewê
Nabê bigîrê, ba şeş û hewtî dû kewê

Herçî ke wa le ser qelemirdare nan exwa
Nabê bêllê topeke berz bêtewe hewa

Eygirinewe, xirape, ewan dêne kayewe
Çiwarnan e ew kesey ke le diway xellkî mayewe

Tenha be babî babî bû, kersiwarê siwar ebû
Êstake ker siwarî siwar e, roy bawî çû

Ew baz û hellbezîn û herrakirdinî xwar û jûr
Nawcergî pak ekirdewe wek awêney bilûr

Her kewiş sûr bû, gorewî çon kurd le pêy eka
Ew singe rût û saxe le kiwê mawe êsteka

Nemdîbû lêre zatu rrî'e û bo birk û werem
Qirjangî zig, firingî melarya, fesadî dem

Ew piyawî bem hewaye ke bem renge helldekewt
Nawî le naw qellemrrewî turka be ser dekewt

Êsteyiş ewane ye le 'Êraqa enasrê
Îtir be paşerok sewî pirrmîwe nakirê

Zorxane pallewanî gelê pê geyandibû
Zor’azmayî destî lerrî têk şikandbû

Her pallewanê kîswetî çermî dekirde ber
Sengî degirt heta sedûpencay ebirde ser

Diwayî şinew bû, sing û perasûy ekird be berd
Herçî şinewî ekird le cîhan da debû be merd

Înca be mîlî şeşmenî serşanî nerim ekird
Konesiwar be tepllewe meydanî gerim ekird

Dû pallewan be uştulim û rezim, naw û daw
Çingiyan edaye yek weku dû şêrî tund kiraw

Herçend ayin û oynî zoran bû derdekewt
Herçî ke pallewanî be nawiyan bû paş ekewt

Îdmanî êste hatote ser bezmî xwardinewe
Herçî ke zorî xwardewe, başpallewan ew e

Pêkêkî ziyadî kirde ser ewsa ye cê be cê
Hoş û demar û pare be carê le kîs eçê

Bo neş’e û îştiha ye, ewend ke ker nebî
Lêre heram e, xot nexeye şîw û terr nebî

Çend salle Ewrupa û Emerîka heramî kird
Wa taze ême ser le niwê kewtûyne dest û bird

Ew cêge yarîye xoş e ke çîmen bû ser be ser
Êsta le şûşe şose ye ger piyadekey guzer

Dayikî weten delê: Ke esîrî zemane bim
Bem kirdewey bed be hîway çîyî emane bim?

## Watey kon

Ew kesey ke wa feqîr newaz e
Legell firîştey 'erşa hamraz e

Wek kiwêr be rê da merro, wirya be
Ta nekewiye çall, bang key "ay babe"!

Le jêr seqfêk da în kollekey nîye
Eger birruxê, desellat çî ye?

Em seqfe ke wa bê kolleke ye
Nazanî bo to sayey ta keye?

Katêk ezanî ethawêjne çall
Ya kifnit ebê, ya bê peştemall

Marî gorr, narî dozex le bere
Bo em dû derde, çî çareser e?

Eger macûnî Xuwa peristît bird
Xot lew dawîşe parast û derkird

Zor xot mexere gêjî dinyawe
Çend melewanî tê da xinkawe

Nefist marêk e pêkurrey şeytan
Ke firsetit da, etgezê be dan

Xuwa pêman ellê rêy çake bigrîn
Bo êmeyetî, ezanê emirîn

Egîne diyar e ew bakî nîye
Îhtiyacêkî piyawçakî çî ye?

Barî gunahî qursman kewte ser
Ebîn be kerî şelî bar neber

Sûçî xot le pêş xellka bibîne
Hesûd derbarey piyawçak be qîn e

Be çawbirsêtî hellmekutere naw
Murx bo daneye, ekewête daw

Ke le karwana paret pê nebû
Hîç tirsit nebê, bê piştên binû

Eger ziyanit le kesê dabê
Toyiş dêtewe rêt, rojêkit mabê

Razî derûnit melê lelay kes
Dem dirraw mebe, xot bizane û bes

## Wîrrewîrr, bo ziwîr..!

Xuwa êmey rengreng siruşt pê dawe
Rengî hîç kesî be kes nedawe

Ebînî dû kes be yek eşubhên
Ke çî be kirdar le yektirî ciwên

Yekê arezûyî be şîrînî ye
Ewî tir meylî şîrînî nîye

Yekê wek bêzûker tirşî ewê
New nawî mebe, aman namewê

Yekê sewday şî'rî mewzûn e
Yekê be tîrî şî'ir dillxûn e

Hîwaman heye be kişşemir  e
Ellê pêt witûm kişşe to bimire

Sa tuxuwa "mire" û "bimire" çend dûr in
Herçend kulane û gorr herdû jûr in

Kone piyawêkman be teqey qezwan
Ne dînî le la ema ne îman

Melayekman bû etwut sêpar e
Ehate wêzet be nêzey yare

Rehmet le sofî yarey zirêpoş
Boy ramekirdîn yestirî çemoş

Êsta desteyê tûrrey kemsirewit
Be qemçî yareyiş nayêne sirewit

Yare mird le lay namerd nenêjra
Bo girdî yare çend şî‘ir bêjra

Xozge demzanî em sirre çî ye
Nawî hîç kesê le naw da nîye

Keçî to ellêy bamiyekem tirş e
Em hemû xellke rûy le to girj e

De bawkim êre xo Kerkûk nîye
Mela ba mêy bê bew turreye

Ya eger tirş û tirşî xirap e
Rûy xot tirş meke, şîrîn be, ça be!

Egîne ke to mon û tirşrrû yî
Demî kes kîse nîye bîdirûyî

Hî waman heye ke le Xuwa edwê
Rizgarî le tiwanc, bo kê elwê

Boç pêxemeryan le şar dernekird?
Îman nahênrê be kes destûbird

## Xakekeman

Ax bo em xake, dax bo em xake
Hîç kes nazanê emende çak e

Ta hellîkollî awî lê derdê
Ta awî bideyî gulle her her dê

Beheştî penhan Silêmanî ye
Ew dû cog e! Em hezar kanî ye

Birrwanin herçî hesta şaîr e
Le zewqa hemûy wek yek mahîr e

Dirêxa kuşteyî naaştî ye
Serperiştiyekey serbirriştî ye

Seyr ke em care be şi'rî awdar
"Jîn" wek nîştiman, bûwe be gullzar

## Xalle

Xalle! Tû serî bizne qisreket
Be yadgarî manganegireket

Be rencerroy reqenkêllanit
Karêzî bêaw, bîrî wêranit

Tû pîr û terrkî pîrî terrpîrit
Tû zelley zil û peşêwîy bîrit

Tû koke û pijme û wirrêne û pirxet
Tengey henase û dûzeley lirxet

Sabrêne pîrê wek xot rîşboz bê
Behar û hawîn bêzar le koz bê

Be rîş û be gun wek nêr be tûk bê
Kirdey xêwî bê, mê û nîremûk bê

Keleke qupaw, milxirr û lawaz
Le rugerr bêferr, bo aw awatxwaz

Serma birdelle, kokey dû deng bê
Lût çillmin mirxin, henase teng bê

Mirqemirqî bê be dewrey pez da
Netwanê perrê le berzî gez da

Wek kerî 'uzêr her zerrînî bê
Ta demirê awat be perrînê bê

Le gell bizinêkî ebreş û kilikqît
Qeşeng û qeşan, şaxçewt û tûkçît

Diyarîy diyar bin, bînêre bo min
Nawyan lê binênim ”xall” û ”xallojin”

## Xellkî hawarî

Xellkî hawarî çawî bedyan e
Ke çî xenîmî min çawî ciwan e

Şa‘îr teşbîhî mang eken be rût
Seruyîş dadenên le gell balla cût

Mang le rastî rût wicûdî nîye
Seruyîş bêser e nimûdî çî ye

Be lêwit ellên aqîqî all e
Aqîq bêgiyan û bê hall û xall e

Aqîq berdêk e her bo nexş eşê
Lêwit giyandar e û rûhîş ebexşê

Dem demî ‘Îsat bû bû be hawdem
Ew giyan eda û min giyanî bo dedem

Rûy to nexşêk e û Celal daynawe
Seyrî sun‘î ew bê nuqte mawe

## Xeyallatî dewrî kon

Xozge yar ebû be xawenqeriz lêm
Le hemû şiwênêk bataye ser rêm

Yar le naw reza seyrî tirêy kird
Bollêkim lê xward, mest bûm destûbird

Be yadî çawî badamî leylam
Xwênî bedenim bû be ron badam

Firmêskim bo rûyî le berd tika bû
Berd bû be şûşe, gullawî tiya bû

Mangîş le yektir kewtûne gizî
Remezan cejnî le şewwal dizî

‘Eşrey muherrem ke cejnî Nûh e
Bo şî‘e buwe be şîn û newhe

Siwênd exom hêşta yarim nedîwe
Le gellî tûş bûm, hoşim perîwe

## Xeyallî xallî

Xeyallî xallî herga bê be dillma dûkellî nallem
Weha reş dadegîrsê, tem dexate ser serî ‘alem

Le jêr birjangewe pirşingî çawî wa birîskey da
Witim seyyaley berq e û le hewrî reş buwe peyda

Beharan gull le jêr xaka ke zîndû ebinewe û errwên
Le ‘eşqî ew beroke spîye, zerd û sîne çak dedirên

Nîgay ew çawe badamîye wehay kar kirde ser e‘zam
Hemû xwênî leşim yekser be carê bû be ronbadam

Be yadî rûy gullî, çawim le ser berdê ke girya bê
Ke berdiyan kird be şûşe pirr gullawe!! ‘Eşiq ebê wa bê

## Xizmîne çi şitêkî.......

Xizmîne! Çi şitêkî başman bû, ke çî wa gum buwe
Êşî zorî bo debînîn, wa le destman derçuwe
Hakimêk bû, ‘alemêk giwêy lê degirt, wa royîwe
Kewtime dûy bîgêrrimewe, nazanim êsta kiwê çuwe
Nawî ‘eyb e, ew nema, wa êsta pekman kewtuwe

Carî caran bitwitaye ‘eyb e, xellik şermî ekird
Herçî hellgirtaye ‘eyb bû, day ena zû destûbird
Taze piyakewtû xerîkî bûn le nawyan derebird
Nuqteyekyan xiste ser ‘eynî be xeybyan naw ebird
Seyr ken wa ‘eyb le destyan xeyb e, xoy gum kirdewe

Quwet û pişt û penay exlaq bû bo em ‘aleme
Ger billêm ziyatir le ‘Usbe hukmî bû, hêşta kem e
Ellbete rêy paredizîn û xwênmjîn ber bû be me
Ehlî namûsîş le layan wa ye rojî matem e
‘Eyb nemawe boye xawen pare wa serkewtû we

## Xozge

Xozge tefrey wam bîr ekirdewe
Dill û çawim pê jîr ekirdewe

Dill egirî le ber derdî tenyayî
Çaw egirî le ber nûrî bînayî

Xuwaye emane to wat lê kirdin
Nazanim boçî bem derdet birdin?

Boç ew afetet nîşan da be çaw?
Çaw şirîxey kird, bo dill û henaw

Wa danamirkên em dû mindalle
Gîzegîzyan e wek zerdewalle

Ellêm girroz bûn ba biyandem bew
Ax xoy dillrreqî wer'egirin lew

Dartaş ke cerde teşwêkeyan bird
Eyda be serya û bêdadî ekird

Bo ewey nebû teşwêkeyî eben
Eygut rencerro m, demeswêy eken

## Ya pêxemer

Pêxemerekey xoşewîstî Xuwa
Hîç kesî tirit nehatuwe le diwa

Diyar e her karêk Xuwa pêy spardî
Wat kird, kes neykird, boyêkî nardî

Fermanî xuway xot wa hênaye dî
Nardinî kesî dî pêwîst nedî

Her çonê wîstî to wat kird, derkewt
Bewe xatemî xatemît destkewt

Toyiş xot çonit wîst siruştit wa ye
Eme xatîmey lutfî Xuda ye

Xoyî û firîşteyî be diyarî to
Sellawatyan da le dîdarî to

Emirîşî fermû be ehlî îman
Be serta rehmet barê wek baran

Wa êmeyiş emrî Xuwa be cê dênîn
Sellawat edeyn, mewlûd exwênîn

Bellam tarîk e hemû layêkman
Wa cûyiş tema'î kirdote lakman

## Yadêkî hezîn

Piyaw debê le ser qewlî bimênê
Ser û mall bida û bellên neşkênê

Le ser pêstî xoyî şeqî ken wek ga
Pêstî kelleyişî biaxnin be ka

Bazgeştî nebê le 'ezmî merdî
Tarîx bê bilê: Gurdî neberdî

Xo eger le rêy mîlliyeta bê
Aza û şêtgîr bê, nebezê ta bê

Min em merdîyem le kurda dîwe
Şînî şehîdan emeyî nûsîwe

Emrro ke bîstûçiwarî azar bû
Serdarî kurdan ser le ser dar bû

Le Diyarbekira gewrekanî kurd
Le tenafdiran nalleyan nekird

Şêx Qadir newey Şêx 'Ubeydulla
Îrsî ciddî bû zullmî kerbela

Le ser sêdare bangî kird megirîn
Ba min bikujrêm, mîlletim bijîn

Duktor Fuadîş witî: Wa emirim
Mîratî bawkim e min werîegirim

Min hemû salê bîr exemewe
Hem be fexrewe, hem be xemewe

## Yadî nazdaranî caf

Porre ciwanekey dewrî zerdiyan
Hay bo kinaçet demî beyaniyan

Katê sifîdey seher derkewê
Pêşxaney şefeq le kêw ser kewê

Demî bêdarî ke destî Miryem
Qonaxey 'Îsa eşiwa le ser çem

Awî zîndegî dête zemzeme
Ebê be Zemzem awî ew çeme

Zellm û Tancero dest le milan bin
Serpopey gullan cêy bulbulan bin

Dengî kinaçet berz û serazad
Deng bidatewe bê tirsî seyyad

Le kenarî Zellm ew sewze giyaye
Towî kenîşkî cafî tê da ye

To be kinaçe û lence û larewe
Min be çawêkî firmêskbarewe

Beramber be yek herdû binallîn
Herdûkman wek yek bo xêll ewdall în

Giwêm le dengit bê be yadî caran
Kiwa malle gewre û polî nazdaran?

Minîş be ferdî Mewlewîyewe
Be horey gullbang pehlewîyewe

Be şînî tîpî nazdaranî caf
Dûkellî ahim pirr ka semay saf

“Wek çîhrey xeyall ruxsarekey xoy
Le perdey dilley pirr ax û pirr oy

Şu’ley rûy niwand şay sosen xallan
Kem kem le goşey burcî reşmallan

Le tiwêy tarîkî şedey Bêgerda
Le tafet awî zîndegî derda”

Êsta le şiwênî ew ’îşwe û naze
Bayequş le gell to da hamrraz e

Êllî Caf rêgay kiwêstanyan nîye
Nazanim meylî felek be çî ye

Umêdim wa ye her bem zuwane
Êllat biçinewe bo ew kiwêstane

Welî Dêwane wîstî le Yezdan
Ke rêy Şem) nebê biçêt bo kiwêstan

Ewsaye du’ay ew gîrabûbû
Êsta bazarrî Welî be ser çû

Cênişînî ew minim emewê
Êll bo hewargey kiwêstan serkewê

Bellam kiwa şikoy say malle gewre
Kiwa ew zemzeme û şadî ew dewre

Êsta qel û dall le ser dirrk û dall
Lew şiwênheware epirsin ehwall

Minîş be wêney ewan dax le dill
Yadî nazdaran ebeme jêr gill

Egirîm û ellêm be dîdey nimnak
Dadî nîştiman ebeme jêr xak


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## Zehabî Zehawî

Tewekkulî nebû emsall, emende xoll barî
Te'amulî nebû, hewir kewte giryew û zarî

Felek bû xakî ebêjayewe be sermana
Melek bû çawî deyêşayewe le giryana

Be bay zehawe beharan, ke hewrî reş degirî
Be şînî bulbul e giryanî şewnim û hewrî

Hezarî gullşenî em xake pake bo tak bû
Fezay edeb be çiray şî'rekanî rûnak bû

Îtir nemawe umêdim le darî dunya da
Bigate rîzî Cemîl Sîdqî kes le Zewra da

Be mesre'êk e demî merg û tercemey hallman
Kisûfî roj e zehabî Zehawî lay 'alman

## Zerdeştî

Tazegull royî û le baxa dirrkî pîr her mayewe
Gêj e herçî xoy exate gêjî em dinyayewe

Dadî ayînman le dest meynoşî û reşpoşî ye
Heş be ser ew cejne wa şerxoş ya serxoşî ye

‘Adetî cejnî musullmanane yektir maç eken
Cejinî êsta matem e, ew maçûmûçe la deben

Bêt û şew to bêyte lam, roj e; çiram lazim nîye
Bêcige lew teşbîhe min pîşem çirawekujênî ye

Zullf ke rûyî dapoşya ye, dad û hawaryan ekird:
Xellke! Mang gîra, le tepill û dumbellek den destûbird

Êsta zullif birra, şehab gîrawe, manggirtin nema
Heyf e hêlaney dillan şêwaw e, bêbên e seba

Hênd be azadî diro, em ‘alemey pê hellperrî
Kewtine jêr qeydî birrîn, her qeydî mûy zillfiyan birrî

Pîrî bêpîrew le sermana demaxim wa sirr e
Êste hallawê le pîla û pilawî xoştir e